Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ | SAL: 1 HEJMAR: 15 | 26 REŞEMÎ 1995 | BUHA:25.000 TL(KDVD)

Mirov nikare li Ewrûpayê dîn jî bibe

Divê ev tişt ne ji derî îmkanê be, heke yek herkesî wekî xwe bibîne. Bes li pêşiya afrîkiyan du asteng hene; ew nikarin xwe bi hêsanî ji ber çavan winda bikin. Li aliyê din, ewrûpî wan her tim wekî malê xwe yên ku ji mêtingehên berê hatine, dibînin.

Rûpel 5

Yek bê kuştin, wê çar rabin...

Xelkê me dixwaze li her derê meseleya xwe bi pêş ve bibe. Ev xelkên me yê ku ji welatê xwe hatine surgûnkirin an jî, ji ber hinek tiştan hatin tirsandin, li metropolan dîsa meseleya xwe bi temamî tînin bîra xwe. Li Kurdistanê çawa hereket dikin, li metropolan jî eynî bi wî şeklî têkoşîn û jiyana xwe ya berê didomînin.

Rûpel 16

Peqikên barana biharê

Li nava rez, hîn nû dest bi karê xwe kiribûn, ewrekî reş û tarî xuya bû. Baranê hûrik hûrik dest pê kir. Ji bo ku xwe ji baranê biparêzin, çûn hundirê xaniyekî ku ji bo mahserê çêkiribûn. Rûniştin, li benda sekinîna baranê man.

Rûpel 11

Sonda Neteweyî û îdeolojiya fermî

Xewnên mirovan jî bi qasî jiyana wan kor in. Jiyana kemalîstan jî, bi Misak-i Milliyê (Sonda Neteweyî) hatiye tixûbkirin. Xewn û xeyalên wan bi vê sonda nebixêr û bêkêr sînor bûne. Bi berçavka vê sondê li bûyerên dinyayê dinêrin. Ji ber vê ye ku, ji riya zanistiyê, ji riya aqil, bi dûr dikevin.

Rûpel 12

QURANA BI KURDÎ

Welatê Me li ser şaşî û kêmasiyên wergera Quranê bi wergêrê wê Abdullah Varlı re axivî

- Heta niha gelek kesan Quran bi kurdî şîrove kirine û tevsîra wê çêkirine. Lê cara pêşîn e ku bi temamî li kurdî tê wergerandin (tercûmekirin) Ev yek bi destê Mele Abdullah Varlı pêk hat. Varlı, ji aliyê din ve werger ji kîsê xwe da çapkirin û weşandin.
- Lê der heqê ziman rastnivîs, alfabe û gramerê de bû hedefa rexneyan. Zimanekî navçeyî hatiye bikaranîn. Abdullah Varlı daxuyand ku wî devoka mamedî ya kurmancî bi kar aniye û ev devok li cografiyeke mezin a Kurdistanê tê axaftin.
- Mele Abdullah Varlı, ne bi tenê ji aliyê devoka ku bi kar aniye ve, ji hêlên din ve jî bal kişande ser xwe. Pirsên ku der barê xebata wî de hatin kirin, wî bersivandin.

Rûpel 8–9

LI BATMANÊ DI MEHEKÊ DE 20 KES WINDA BÛN

- Ji sersalê heta 15'ê meha reşemiyê li navenda bajarê Batmanê 20 kes bi awayên cur bi cur hatin revandin û windakirin. Malbatên kesên windabûyî bala saziyên demokratîk dikişînin ser rewşa Batmanê û dibêjin ku tedbîr neyên standin wê kesên windabûyî careke din neyên dîtin û hejmara mirovên windabûyî zêde bibe.
- Di sê salên dawî de li bajarên mîna Batman, Diyarbekir, Farqîn û Nisêbînê bi sedan kurdên welatparêz bi awayê cinayetên faîl-î meçhûl ji jiyana xwe bûn. Li gorî agahiyên dawî, niha jî hejmara kesên tên revandin zêde dibin.

Rûpel 2

www.arsivi.org

PIŞTÎ CINAYETÊN FAÎLÎ MEÇHÛL NIHA JÎ WINDABÛNÊN FAÎLÎ MEÇHÛL LI KURDISTANÊ BI TAYBETÎ JÎ LI BATMANÊ ZÊDE DIBIN

LI BATMANÊ 20 KES WINDA BÛN

Li Batmanê di heftiyên dawî de hejmara kesên ku winda dibin her diçe zêde dibe. Ji sersalê û bi vir ve li Batmanê li dora 20 kesan winda bûne. Di nava kesên windabûyî de belavkerekî rojnameya Özgür Ülkeyê û serokê şûbeya sendîkaya Belediye İş'ê jî hene.

Li bajarê Batmanê ku salê çûyî bi sedan kesên welatparêz bi cînayetên faîlî meçhûl ji holê hatin rakirin, niha jî zêdebûna hejmara kesên windabûyî mîna windabûnên faîlî meçhûl têne bi navkirin. Di pêvajoya meh û nîvekê de windabûna bîst kesên welatparêz mîna metodeke nû ya ku dewlet diceribîne, tê nirxandin.

Ji kesên ku ji sersalê û vir ve windabûne û navên wan hatine tesbîtkirin ev in: Osman Küntes, Selahattin Yasak, Halil Aytemur, Ramazan Kaban, Halil Tunç. Xeynî wan 16 kesên din ên ku me navên wan baş tesbît nekirine jî hene. Ji bilî vê yekê xwendevanekî lîseyê (Zahîr Balan) roja 11'ê rêbendanê ji aliyê du kesên nenas ve bi êrîşeke çekdar hate qetilkirin.

Li gor agahiyên ku me der barê kesên windabûyî de bidest xistine, pêşî roja 9'ê rêbendanê mamosteyê dibistana seretayî Selahattin Yasak di riya dibistanê de ji aliyê du kesên ve bi erebeyeke Toros marqe hatiye revandin. Heta niha derbarê wî de agahiyeke din nehatiye standin. Roja 10'ê eynî mehê esnafekî ku navê wî Halil Aytemur e, ji aliyê çar kesên ku xwe mîna polîs pê dane naskirin ve hatiye revandin û windakirin.

Wekî din, Belavkerê rojnameya Özgür Ülkeyê Ramazan Kaban (17) eynî roj dema ku ji malê diçe buroyê di rê de ji aliyê du kesan ve hatiye revandin û hê jî tu xeber jê nehatiye standin. Serokê şubeya sendikaya Belediye İş'ê ya Batmanê Osman Küntaş (42) jî roja 4'ê reşemiyê ji kuçeya 844'an ya taxa Kısmetê ji aliyê du kesan ve tê revandin. Li gorî kesên ku dîtine, van her du kesan Osman Küntaş bi erebeyeke resmî ya ku plaka wê 34 UHH 75 e revandine.

Dîsa di wan rojan de esnafekî bi navê Halil Tunç ji aliyê hin kesên nenas ve hatiye revandin. Wekî din boyaxvanekî ku di dema qetilkirina Zahir Balan de li cihê bûyerê bûye û qetil dîtine, ji aliyê polîsên ku hatine cihê bûyerê ve hatiye birin, careke din nehatiye berdan û tu xeber jê nehatiye standin. Ji xeynî van kesên ku navên wan tê zanîn, saziyên demokratîk niha dixebitin ku navên 14 kesên din ên winda ne hîn bibin û bi naskiriyên wan bidin teyîdkirin.

Li ser van windabûnên faîlî meçhûl an wekî ku zehfê Batmaniyan dibêjin faîlî dewlet, malbatên van welatparêzan dane zanîn ku ji jiyana wan endîşe dikin.

Wisa xuya ye ji niha û pê ve ji bo ku rê li ber van windabûnan bê girtin lazim e ku Batmanî bi serê xwe dernekevin derve û bi tenê neçin tu deveran. Li gorî hin kesên ku rewşa Batmanê baş dizanin, eger dema yek bête revandin û kesên ku dibînin bêdeng bimînin û tev bi hev re êrîşî ser van kesên direvînin nekin, wê hejmara kesên winda di demeke kin pir zêde bibe.

Batman/Welatê Me

Hilbijartina parlementoyê dest pê kir

Ev hefte li gelek deverên Ewrûpayê gelê kurd ji bo parlementoyê dest bi hilbijartina delegeyan kir. Hate gotin ku deverên ku hilbijartin lê çêbûne, gel eleqeyeke mezin nîşan daye.

Li Almanyayê, li gelek bajaran hilbijartin çêbûn. Li Düsseldorf, Bonn, Köln û Hamburgê TAJK'ê (Tevgera Azadiyê ya Jinên Kurd) û YCK'ê (Yekîtiya Ciwanên Kurd) ji bo parlamentoyê delegeyên xwe hilbijartin.

Li Fransayê, li Parisê YCK'ê û TAJK'ê hilbijartina xwe çêkir. Dîsa li Parisê ji bo 3 delegeyên ERNK'ê (Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê) 1300 mirovên Kurdistanî rey avêtin.

Li Îngilistanê jî ji bo delegeyên parlementoyê, YCK'ê û TAJK'ê hilbijartina xwe çêkirin. Li wir jî gelek Kurdistanî beşdarî hilbijartinê bûn. Di hilbijartina ku ji aliyê YCK'ê ve hate tertîpkirin de 174 kesan reyên xwe bikaranîn û ji sê berendaman yek hilbijartin. Dîsa li Londonê ji TAJK'ê (Tevgera Azadiyê ya Jinên Kurdistanê) jinek ji aliyê 160 kesên ku dengên xwe bikaranîn ve hate hilbijartin

Kurd-A / Welatê Me

JI ROJEVE

ÇARE HEVGIRTIN E

Li Batmanê di pêvajoya mehekê de 20 kurdên welatparêz ji aliyê hêzên tarî ve hatin revandin. Her çiqas ji van kesan re hêzên tarî an jî faîlî meçhûl tê gotin jî, diyar e ku ev hêzên dewletê bi xwe ne. Bûyerên ku qewimîne vê yekê teyîd dikin. Gelek ji wan kesên ku windabûnê ji aliyê kesên ku xwe mîna polîsan dane naskirin, hatine revandin. Wekî din, yek ji wan kesên winda ji ber ku di dema cinayeteke faîlî meçhûl de li cihê bûyerê hazir bû, dîsa ji aliyê polîsan ve tê binçavkirin û careke din tu xeber jê nayê standin. Bi vî awayî hêzên tarî dixwazin bi metodeke nû çavê gel bitirsînin. Di rewşeke wisa de tedbîra herî baş û muhîm ew e ku gel bi xwe, hay ji hev bimînin û çavê xwe li hemberî kirinên dijmirovî negirin. Dema yek bête revandin, gerek e çi kesên li wir hazir êrîşî ser wan kesan bikin û rê nedin ku li ber çavên wan însan bêne kuştin an jî revandin. Dema gel li hevûdin xwedî derkeve ne mumkun e di nava rojê de du kes an jî çar kes yekî ji navenda bajêr birevînin. Tenê tiştek dikare vî gelî li paş bixe, ew jî tirs e. Piştî tirs hate şikandin tu zincîrên pola xwe li ber girseyên gel nagirin.

'Gelekî bê artêş nikare parlamentoyê ava bike'

Ali Sapan

Roja 18'ê reşemiya 1995'an li Hollandayê li bajarê Den Haag'ê nêzîkî 2000 Kurdistanî beşdarî Civîna Gel ku Komîsyona amadekar ya PKS'ê li dar xistibû, bûn.

Civînê li salona sporê ya Den Haag'ê bi marşa Ey Reqîp dest pê kir. Hozanên Hûnerkomê marşên xwe yên berxwedanê pêşkeşî beşdaran kirin. Piştre ji Komîsyona Amadekar berdevkê ERNK'ê Ali Sapan, Remzî Kartal û Ali Yiğit axivîn. Sapan di axavtina xwe de li ser pirsgirêkên kurdan, îktîdarbûn, dewletbûn û dîroka avakirina Parlementoya Sirgunê sekinî. Axatina xwe bi" Partiya me PKK ne li çepê ne li rastê ne li bin û ne li ser e di nava parlementoyê bi xwe de ye. Dîrokê nîşan daye ku tu gel bêartêş nikare parlementoyê ava bike. Parlementoya Kurdistanê ya Sirgunê pişta xwe daye gelê kurd û artêşeke xurt. Emê têkiliyên xwe yê ku hene dewrî parlementoyê bikin. Parlemento ji bo ku pirsgirêkên civakî, aborî, perwerdeyî û rêxistinî yên gelê me yê li sirgunê çareser bike, wê xebate bike" qedand.

Ali Yiğit li ber mijara dîroka tevgera neteweyî sekinî. Piştî Ali Yiğit, Remzî Kartal bi me da zanîn ku, "Ewê bi gelê xwe re îxanet kiribe, bi dijmin re alîkarî kiribe û li dijî tevgera neteweyî ne di parlementoyê de nikarin cih bigirin."

Xwendekaran got: 'Êdî bes e!'

Li Stenbolê xwendekarên Zanîngeha Boğaziçiyê li dijî zema xwaringehê protestoyek li dar xistin. Nêzî 1000 xwendekarên vê zanîngehê roja 22'ê reşemiyê, neketin dersan ji kampûsekî heta kampûsê din meşiyan. Xwendekaran ji bilî vekişandina zemê, bi sloganên xwe zanîngeheke demokratîk û zanîstî jî xwestin û wan da zanîn ku heta buhayê xwarinê danakeve ew dê xwaringehê boykot bikin. Piştî arizîkirina xwaringehê di nava du salan de xwarin ji 5 hezarî bûye 40 hezar.

Li Êlihê 50 leşker mirin

Li Êlihê, li gundê Mirdêşê hêzên dewletê yên ku derketine operasyonê ketin kemîna gerîlayan. Di kemîna gerîlayan de gelek leşker mirin. Piştî kemînê, şer du qasî rojan dewam kir.

Roja 20'ê reşemiyê Leşkerê Alaya Êlihê û cerdevanên navçeya Eskîfê derketin operasyonê. Gerîlayan li nêzîkî mezraya Mirdêşê kemîn avêtin pêşiya leşkeran. Piştî cerda gerîlayan şer du rojan dewam kir. Li gorî çavkaniyên herêmê, nêzîkî 50 leşker mirine û gelek jî birîndar bûne. Gerîlayan di vî şerê de tu zayiyat nedane. Piştî şer, ketin û jêderketina herêmê hate qedexe kirin.

Gerîla riyan digirin

Roja 15'ê reşemiyê gerîlayên ARGK'ê riya Şirnex û Cizirê xistin bin kontrola xwe. Wan di kontrola rê de li nasnameya nêrîn û propaganda kirin. Leşkerên ku ji bo mudehaleyê hatin, ketin kemîna gerîlayan. Di kemînê de hêzên dewletê bi çekên giran hatin gulebaran kirin. Li gorî agahiyên ku ketin destê me, 18 leşker mirine û 7 leşker birîndar bûne.

Dotira rojê (16'ê reşemiyê) gerîlayan riya Midyadê û Nisibînê girtin. Piştî kontrola nasnameyan wan kesekî bi navê Fehmî .... kuştin. Hate gotin ku ew kes ji ber karê kontratiyê hatiye kuştin. Kamyoneke cerdevanan, trektorek jî ji aliyê gerîlayan ve hate şewitandin. Di dawiya rê girtinê de hêzên dewletê bi helîkopterê xwestin ku mudehale bikin. Gerîlayan bi roketê helîkopterê xistin. Der heqê mirî û birîndarên di helîkopterê de agahî tune ne.

Batman/Welatê Me

Cunta jî vê mesûliyetê hilnagire

Berdevkê parlamentoya Tirkiyeyê Hüsamettin Cindoruk ji halê Tirkiyeyê ne qayil e. Heftiya din roja duşemê Cindoruk dîtin û fikrên xwe yên xembar yên li ser ekonomiya Tirkiyeyê ji rojnameya turkish daily Newsê re anîn zimên. Cindoruk di hevpeyvînê de dibêje ku cunta jî naxwaze bikeve bin mesûliyeta vê krîza ekonomîk

Berdevkê parlamentoyê cenga ku li Kurdistanê didome jî wekî sedema herî zehf ku zerarê dide ekonomiyê dinirxîne û dibêje ku di vî şerî de PKK bi awayekî nerasterast (endirekt) gihîştiye armanca xwe.

Ji vê hevpeyvînê hinek bersivên balkêş ku wî dane pirsên rojnameyê ev in:

Hûn rewşa niha ya Tirkiyeyê çawa dibînin?

– Ekonomiya Tirkiyeyê ji Şerê Cihanê yê Duyemîn bi vir ve tu car neketibû rewşeke wiha xerab. Rewşa Başûrê rojhilat (bakurê Kurdistanê) tesîreke mezin li ekonomiya me dike. Şer barekî nekêmî 500 triliyon lirayî li me bar dike.

Nexwe, mirov dikare bibêje ku ev serkeftina PKK'ê ye, eger ku ew dixwaze Tirkiyeyê hilweşîne ?

– Bi awayekî endirekt erê. Dikare bê gotin ku ew di armanca xwe ya di warê hilweşandina aboriya Tirkiyeyê de serkeftî ne.

Kamran İnan (mebûsê ANAP'ê) dibêje ku heke rewş wiha bidome wê gel serî hilde û derkeve kolanan, hûn jî di vê dîtina wî de ne?

– Gelê tirk hez nake ku derkeve kolanan li mafê xwe bigere. Ew ji dewleta xwe re sadiq e, ew êdî zehftir dixwaze bi riyên legal li mafên xwe bigere. Ez bawer im ku wê rêxistin û girseyên demokrat vê yekê bikin. Yanî gelê tirk wekî yên rojava û afrîkayê serî hilnade. Lê karker û karmend wê bi banga sendikayên xwe kolanan dagirin. Hingê wê ew û hêzên dewletê werin hemberî hev. Wekî encameke xwezahî hêzên polîsan û kûçikên wan wê li hemberî gel bên bikaranîn.

Di dawiyê de derbeyeke leşkerî xuya dike an na?

– Hikûmet ne serkeftî ye, lê tu caran ji bo serneketina hikûmetê derbeya leşkerî çênabe. Sebebeke din jî heye; artêş bixwe jî naxweze bikeve bin vî barî giran û mesûliyeta krîza aborî hilgire ser milên xwe.

Navenda Nûçeyan

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 13'an de peyva veşarî **'Pêşbazî'** dîtine û pirtûka **"Şevên Spî"** qezenc kirine:

Zana Şıl
Batman
M. Ali Mutlu
Malatya
Nurullah Palamut
Almanya
Ercan Yaşar
Diyarbakır
Mehmet Aydemir
Seyhan/Adana
İbrahim Cantepe
Buca/İzmir
Fırat Aslan
Midyat/Mardin
Ayhan Yıldız
Diyarbakır
Ülfiye Seyad
Mersin
Fadime Genç
İzmir

Birêz Kartal Jîndar, pirtûka Jan Dost "Kela Dimdimê" we di xaçepirsê de qezenc kiribû. Lê pirtûk li me vegerî. Ji kerema xwe li me bigerin.

Serokê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) Akın Birdal:

'Tirkiye bi vî awayî nikare bikeve nava Yekîtiya Gumrikê'

Serokê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) Akın Birdal roja 21'ê reşemiyê (meha 2'yan) bi civîneke ji bo çapemeniyê rapora komeleyê ya meha rêbendanê (meha 1'emîn) daxuyand.

Wekî Rêxistina Efûyê, Rapora Dewleta Amerîkayê û Seroka Keskan ya Parlamentoya Ewrûpayê Claudia Rothê jî daxuyandibûn, Birdal xwest ku kesên ji ber fikr û ramanên xwe hatine girtin werin berdan; qedexeya li ser eşkerekirina bîr û baweriyan û qanûnên ku dibin sedema van tiştan ji holê rabin. Akın Birdal xwest ku dawî li pest û pêkutiya li ser çalakdarên mafên mirovan û sansura li ser çapemeniyê jî bê.

Serokê Komeleya Mafên Mirovan got ku divê ji bo rawestîna kirinên mîna; îşkence, kuştinên "kiryar nediyar", kuştinên bêdarizandin, di bin çav de windakirin, bisekinin. Ji bo vê yekê tiştên pêwist bên cih.

Wî got: "Divê li rojhilat û başûrê rojhilata Tirkiyeyê, valakirin û şewitandina gundan dawî lê bê. Zirara ku gihîştiye mirovan dewlet hilgire ser xwe; cerdevan û tîmên taybet divê ji herêmê vekişin; sîstemeke sivîl û demokratîk li wir ava bibe."

Serokê KMM'ê (İHD) Akın Birdal

Xeynî wan, Akın Birdal da zanîn ku divê mebûsên DEP'ê bên berdan û mafê mebûsiyê jî li wan vegere. Wî got: "Heke Tirkiye van gavan neavêje, nikare beşdarî Yekîtiya Gumrikê bibe."

Di rapora İHD'ê ya meha rêbendanê de ev agahî cih digirin: Di nava mehekê de 23 kesan îşkence dîtiye, 28 mirov (di bin çav de) winda bûne, 12 kes bi îşkenceyê û bêdarizandin hatine kuştin. Meha çûyî 61 weşan hatine berhevkirin, 19 cih ji aliyê kesên nenas ve hatine bombekirin.

Di eynî mehê de 84 jê rojnamege, 1233 kes ketine bin çav û ji wan 253 hatine girtin. Li herêmê 16 gund hatin valakirin.

Piştî lihevxistina 242 kes hatin kuştin.

Navenda Nûçeyan

Dewlet muxalîfan naxwaze

Dewletê piştî ku rojnameya Özgür Ülke bi hinceta ku ew dewama Özgür Gündemê ye girt, îcar berê xwe da weşanên din yên sosyalîst. Niha rojnameya Dengê Azadî wekî dewama rojameya Azadî'yê, Newroz wekî dewama kovara Newrozê û Kurtuluş jî wekî dewama Mücadeleyê û hwd. tê binavkirin. Dewlet dixwaze bi vî awayî dengê hemû weşanên muxalîf bibire. Helbet ev biryarên mehkemeyên "serbixwe" ne tesadûf in.

Rayedarên tirk êdî li derve jî birîna dengên muxelîf diparêzin wan kirinên xwe bi sebebên siyasî ve girê didin. Mînak; Balyozê Tirkiyeyê yê li Washingtonê Nuzhet Kandemir, di nameyeke ku heftiya çûyî ji parlamenterê amerîkî Christopher H. Smith re şand de, qerara girtina Özgür ülkeyê bi sedemên siyasî şîrove kir.

Christopher H. Smith roja 9'ê reşemiyê li Kongreyê bi axaftinekê bal kişandibû ser girtina Özgür Ülkeyê û doza li hemberî Yaşar Kemal. Wî dabû zanîn ku li Tirkiyeyê şerê li hemberî azadiya eşkerakirina bîr û baweriyan gurtir dibe. Smith gotina xwestibû ku Tirkiye dev ji xapan berde, ji bo pêkanîna sozên ku danê raya navneteweyî, hinek gavan biavêje.

SAMÎ BERBANG

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 14'an; pirtûka **Mehmed Uzun** **"Siya Evînê"** ye. Ev pirtûk ji aliyê weşanxaneya DOZ'ê ve hatiye çapkirin

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê binivîsînin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Xelata Xaçepirsê

"Siya Evînê"
Mehmed Uzun

XAÇEPIRSA BIXELAT 13

XAÇEPIRSA BIXELAT (15)

'Mirov nikare li Ewrûpayê dîn jî bibe'

Fîlmên te her tim li ser pereyan û bandora (tesîr) ku ew li mirovan dike radiweste.

– Ji bo min pere wekî zibil e; ew hem dikare bibe gubre, zeviya te bijûn bike, hem jî dikare giyana te bilewitîne. Di filmê min ê bi navê Hyenas (keftar) de jineke pir dewlemend heye. Ew piştî 30 salî vedigere gundê xwe yê li Afrîkayê. Ew soz dide gundiyan ku wê xelateke giranbuha bide wan heke mehkemeya gund cezayê îdamê bide kesê ku 30 salî berê dilê wê şikênandiye. Gundî şertê wê qebûl dikin. Li gorî min ew pîrek, IMF, Bankaya Dinyayê û hemû dezgehên ku xizaniya mirovan zêde dikin, temsîl dike.

Gelek hemwelatiyên we bar kirin, hatin Ewrûpayê. Tu wan nas dikî?

– Belê, wekî hemû hemwelatiyên xwe yên li cihên cur bi cur, ez wan jî nas dikim. Jixwe, di vê gewrbûna Ewrûpayê de hev û din naskirin gelek hêsan e. Dema em rastî hev tên, wekî birayên hev silavan didin hev û dibêjin: "Tu çi dikî li vê girtîgehê?"

Kîjan girtîgeh?

– Girtîgeha Ewrûpayê. Lewre ev der ji bo şêniyê xwe girtîgeh e. Ma bi rastî li gorî we li Ewrûpayê di dawiya sedsala 20'an de jiyan ewqas hêsan e? Hûn ji bilî pereyan (ew tiştê ku we bixwe afirandiye) ne tu tişt in. Mirov nikare li Ewrûpayê dîn bibe, mirovan tavilê diavêjin paş deriyê timarxaneyê. Kes nikare kal bibe, ewrûpî kesên kal ji civakê dûr dixin.

Djibril Dio Mambety

Heke Ewrûpa ji xeynî girtîgehê ne tu tişt e, çima hûn ji Senegalê vediqetin?

– Ev xewna derewîn qasî temenê dinyayê kevn e. Rêwingiya ji cihekî ber bi cihekî din mirovan dikişîne. Mirov tim cihê ku diçin, ji cihê ku lê diman çêtir dibînin. Kesê yekemîn dema bi dilê xwe ji Senegalê veqetî, hêvî dikir ku di nava medeniyeta Ewrûpayê de bijî. Wan ji bo dewlemendiya gewr, dev ji rojê berda. Dema Şerê Duyemîn bi hezaran afrîkî ji bo ku Ewrûpayê rizgar bikin, çekek di dest de hatin Ewrûpayê. Wê çaxê, mîna niha kesî ji wan vîze jî nedixwest.

Gelo îmkan nîn e ku mirovên afrîkî di nava civaka Ewrûpayê de bihelin?

– Divê ev tişt ne ji derî îmkanê be, heke yek herkesî wekî xwe bibîne. Bes li pêşiya afrîkiyan du asteng hene; ew nikarin xwe bi hêsanî ji ber çavan winda bikin. Li aliyê din, ewrûpî wan her tim wekî malê xwe yên ku ji mêtingehên berê hatine, dibînin. Heke ew bixwazin ku hûn wan wekî mirovên ji xwe bipejirînin, ew tişt ji bo we gelek bizehmet e.

Wekî fîlmçêkerekî afrîkî, gelo hûn xwe berpirsiyar dibînin ku îmajeke taybet ya Afrîkayê nîşan bidin?

– Ez bi dilşewatî diwazim vê bi îmajeke xurt nîşan bidim. Ez dixwazim Afrîkayê wekî parzemîneke ku mirov wekî mirovan dijîn; cihekî ne ji derî drama mirovahiyê; parçeyekî sereke yê mirovahiyê, teze û nekavilbûyî, nîşan bidim.

Ez li hemberî awayê nijadperestiyê ku dema nirxandina fîlmên afrîkî xwe dide der, zehf hêrs dibim. Bitiriyek mirovên ewrûpî heye; reşikbûn û afrîkîbûnê nolî sedema lêborînê dibînin. Min gelek fîlmên qels yên afrîkî dîtine, ewrûpî dema li wan temaşe dikin, xwe mecbûr dibînin ku ji wan fîlmên qels re li çepikan bidin.

Newsweek

DJIBRIL DIO MAMBETY KÎ YE?

Djibril Dio Mambety wekî fîlmçêkerekî sereke yê Afrîkayê tê nasîn. Fîlmçêkerê Senagalî Mambety di sala 1946'an de li gundekî nêzî Dakarê hatiye ser rûyê erdê. Fîlmên wî ji aliyê hest û sembolan ve dewlemend in. Ew di 15 saliya xwe de bi qayikekê berê xwe dide Marsilyayê. Bi awayê ku ew dibêje, tevî vê yekê jî ew tu caran ji 11 mehan dirêjtir ji welatê xwe dûr nemaye. Djibril Dio Mambety parêzkarekî xurt yê Afrîkayê ye. Mambety wê derê wekî warê nirxên mirovahiyê û hejayî lê jiyanê dibîne. Li aliyê din ew rexneyên tûj li xwînsariya ewrûpiyan digire. Li ser Afrîka û Ewrûpayê dîtinên wî yên cihereng û balkêş hene.

DIK

Nameya Admîneralê

Admîneral û serokê dibistana bilind ya leşkeriyê yê berê Bjorn Bruland, ji serokwezîr Gro Harlem Brundtland re nameyeke bişewat şand. Di nameyê de ew bangî li Brundtlandê dike ku derhal çekên ku difroşe Tirkiyeyê bibire. Nameya wî di Rojnameya Adreseavîsen de derket. Bi kurtî wilo ye: "Derhal çekên ku hûn difroşin Tirkiyê bibirin. Fedî bike Gro! Rayedarên tirkan raste rast gundên kurdan bi erdê re dikin yek, bi awayeke hovî mafên mirovan dipelixînin, nûnêrên gel diavêjin girtîgehan. Şerma mirovahiyê ye ku me çek firotine welatekî wilo bêşerm. Ne firotina çekan; heta axaftinên me yên li ser birînê jî eyba eyban e. Tu li dijî narkotîkê derdikevî, ma çima ne li dijî firotina çekan. Gro! heta ku çekan difiroşî, bibe hevparê aştiyê. Ji bo çareyeke aştî bikeve pêş. Daxwaza vî gelî ji te ev e."

Nameya Bjorn Bruland giran e û li gorî dîtinên ji hev cuda, ew dê nameya Bjorn Bruland tesîreke mezin biafirîne. Ew sekreterê dewletê yê berê û Serokê Xaça Sor e.

Norwec/Welatê Me

REWŞA DINYAYÊ

DR. GUNDÎ DILBERZ

Li ber deriyê sala nû

Nemaze di van rojan de, di rojên hêvî û xwestekan de li ber deriyê sala nû pirsa me ya neteweyî dibe hêvî û xwesteka yekemîn ji bo gelê kurd; hûr û giran.

Hêviya me ya mezin çareserkirina doza me ya neteweyî ye. Xwesteka me jî jiyaneke di nava aştî û wekheviyê de ye, bi hemû gel û mirovan re. Em hêvî dikin ku sala 1995'an bibe sala aştiyê li Kurdistanê û li seranserê cîhanê. Li şûna şer û kuştinan jiyaneke nû konê xwe vegire. Em hêvî dikin di welatê xwe de li ser erdê xwe bijîn, bêzilm û zora leşker û cendirme û dûvikên dijmin û bêêrîş û xwînrijandinan.

Gelê kurd li bakurê welêt, di sala 1994'an de pêkanînên dîrokî, tevî gavên hêja bi pêş ve birin. Têkoşerên qehreman bi cangoriyeke mezin îsbat kirin ku êrîşên bi sedhezaran leşkeran û nûjentîrîn çek jî nikarin zora gelê me bibin. Gelê me êdî doza xwe baş nas kiriye û amade ye ku ji bo azadiya xwe qurbanên giranbuha jî bide. Ev bûye bêhejmar car ku gef û gurên serokhikûmet û serokleşkeran li ber bê diçin û ji wan re şermezariyê tînin. Berê digotin: "Ev çend eşqiya ne." Piştî ku şoreş û bandora wê berfirehtir bûn, gotin: "Ev çend komik in û dewlet wê wan bihêsanî bigire û ceza bike." Ji wê demê û heya niha êdî sal bi sal û roj bi roj fermanên dawîlêanîna tevgera kurdî derdixin û gora şoreşê dikolin. Lê va ye dinya dibîne, ku şoreşa Kurdistanê îro xurttir û firehtir e ji hemû dem û salên derbasbûyî. Vê rastiyê êdî serokên dewleta tirk jî nikarin înkar bikin û car caran ji devên wan derdikeve.

Xurtbûna şoreşê û serhildanên gel û cesareta mirovên kurd li her derê, serokên tirkan neçar kirin ku bibêjin: "Erê kurd hene."

Ev gotin ji bo wan gaveke pir mezin bû. Lê diyar e ku hebûna gelan ne tenê bi lêvkirinê ye. Pêwist e li gorî zagonên navneteweyî û mafê çarenûsiyê ji bo gelan û li gorî destûr û rêbazên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (UNO) û rêxistinên bi wê ve girêdayî, çare bên dîtin.

Kurdistan bitaybetî di sedsala bîstan de bûye welatê serhildan û tevgerên serxwebûn û azadiyê. Rewşa Kurdistanê ji rewşa welatên ku ji aliyê kolonyalîzma kevneşopî ve, hatine dagirkirin, dijwartir e. Ji ber ku heta navê kurdan hatiye qedexekirin.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn gelek welatên dagirkirî li Asya û Afrîka û Amerîka Latînî, xwe ji kolonyalîzma klasîkî rizgar kirin û bûn endemên Neteweyên Yekbûyî (NY). Mafê kurdan jî heye ku dewleta xwe ava bikin û destê xwe deynin ser welatê xwe. Piştî re jî bibin endamê NY'ê û hemû saziyên navneteweyî, bi hemû dewletan re têkevin pêwendiyên dualî.

FAL

BERAN (21 Adar – 20 Avrêl)

Bêhna biharê tê pozê we, di şevên tarî de dilê we dixwaze ku hûn derkevin derve, bigerin. Wê bêhntengiya ku li ser we ye bi aweyekî dilfirehî ji ser xwe bavêjin û rihet bin. Jiyana we wê mutleq biguhere.

GA (21 Avrêl – 21 Gulan)

Hevaltiya ku bi we re tê kirin bêhna menfatê jê tê. Hinek kes bi çavêkî menfatperest li we dinihêrin. Dev ji wan hevalên nejidil berdin. Wekî zivistan û biharê jî rûyê xwe neguherinîn, li qerarekê bisekinin.

CÊWÎ (22 Gulan – 21 Pûşper)

Hûn diçin ber kîjan derî, li we tê girtin. Ev bêşansiya we di demeke kurt de wê xelas bibe. Gereke hûn jî hinekî xîret bikin û vê bêşansiyê ji ser xwe bavêjin. Wê pirtûka ku we nû sitandiye jî bixwînin.

KEVJAL (22 Pûşper – 23 Tîrmeh)

Karê we baş e, lê problemeke we heye. Hûn bi taybetî li ser vê problemê nasekinin. Di rojên li pêş de, ev problem wê giraniya xwe bide ser karên we. Divê hûn wê bi awayekî cihêreng hel bikin. Li xwe baş binihêrin, dibe ku hûn nexweş bikevin.

ŞÊR (24 Tîrmeh – 23 Gelawêj)

Qerara ku we ji bo jiyana xwe daye, tu caran jiyana we baştir nake. Wê îşkenceyê li xwe nekin. Giraniyê bidin ser armanca xwe. Dev ji wan kesên ku rê nîşanê we didin jî berdin, heke wan kesan rê bizanibûna wê riya xwe rast bikirana.

SIMBIL (24 Gelawêj – 23 Rezber)

Di warê rêkûpêkiyê de tu kes wekî we li ser çareseriya probleman baş nafikire, hûn çiqas bi vî awayî bifikirin jî, kêmasiyên we jî hene. wWan kêmasiyên xwe durist bikin, piştre jî zanebûna xwe derxin holê.

MÊZÎN (24 Rezber – 23 Kewçêr)

Wê ji we re çend name werin; hinek baş in, hinek jî nebaş in. Ji wan kîjan baş e, kîjan ne baş ji bo ku hûn karibin ji hev cuda bikin alîkariyê ji çend kesan bixwazin. Hin hevalên xwe dawetî fitarê bikin.

DÛPIŞK (24 Kewçêr – 22 Sermawez)

Zanebûna we ya li ser siyasetê pir be jî, hindik be jî hûn ji gelê xwe re bêfayde ne. Fikrên xwe bikin xizmeta gelê xwe, ku qiymeta we ya rastîn derkeve holê. Xwe veneşêrin, serbest bin.

KEVAN (23 Sermawez – 21 Berfanbar)

Xwestin ji bo we, wekî goreguhartinê ye. Hertim xwastin ne baş e, hinekî jî dayîn pêwist e. Armanc ew e ku mirov daxwazên xwe bi keda xwe amade bike. Di rojên dawiyê de wê jiyana we biguhere.

KARIK (22 Berfanbar – 20 Rêbendan)

Ji bo çi hûn wexta xwe beredayî serf dikin, demserfkirin ne ji bo kesên nolî we ye. Hûn di her warî de zane ne, vê zanebûnê bi karên tewş derbas nekin.Hinek kes li benda we ne, wan li hêviya nesekinînin.

DEWLIK (21 Rêbendan – 11 Reşemî)

Hebûn û tunebûn ji bo we tiştekî ifade nake. Hûn dibêjin: "Bila ez bijîm çawa dibe bila bibe" Van tiştên vala ji hişê xwe biavêjin. Jiyana xwe baş bikin û ji xwe re karekî nû bibînin. Bila serê we hertim bilind be.

MASÎ (20 Reşemî – 20 Adar)

Ku heyv di şevên tarî de rohahiya xwe dide ser çem, kanî, çiya û zeviyan şewqa wê hêviya we ya serxwebûn û azadiyê gurtir dike. Eşqa we li ser tiştên cihêreng be jî, di dilê we de hêviya jiyaneke azad xurt e. Ji çalakiyan dûr nemînin.

Wey li halê karkeran

"Divê %100 meaşên karkeran bête zêdekirin. Eger li Tirkiyeyê rêjeya (nîsbeta) enflasyonê derketibe raserî %150'yan, hingê mafê karkeran heye ku daxwaza zêdebûna meaşên xwe bikin. Reaksiyona karkeran ya li hemberî hikûmetê mafdar û li cih e. Eger, îro kezeba karkeran neşewitîbûya, li hemberî dewletê ew çend dengê xwe dernedixistin." Ev gotin ên dewlemendê duyemîn ê Tirkiyeyê Sakıp Sabancı ne. De were êdî bila gunehê mirov bi karkeran neyê û mirov nebêje: "Wey li halê karkerên li Tirkiyeyê. Karkerên ku nikarin li mafê xwe xwedî derkevin, qedera wan ketiye destê kedxwarekî mîna Sabancı." Esas, gerek e ev tewra zêde me şaş neke.

Eger pêşengê şoreşa Tirkiyeyê, wextê xwe di meyxaneyan de bi nostaljiyê derbas bikin û kesên mîna Bayram Meral meydanê vala bibînin, hinge zehf normal e ku Sakıp Axa û yên wekî wî bi daxuyaniyên wisa ji xwe re kenê xwe bi karkerên Tirkiyeyê bikin. Em çi bibêjin, bila teorîsyenên şoreşa Tirkiyeyê li vê rewşê binêrin û hinekî din nostaljiyê zêde bikin.

M. ROJAVA

Hecî Nadir dizê navneteweyî

Hecî Nadir mirovekî ji bajarê Wanê bû. Ew di warê diziyê di zehf jêhatî bû. Heta mirov dikare wî wekî dizekî navneteweyî jî bi nav bike. Ji ber ku ew li welatên mîna Îran, Iraq û Suriyeyê gerîbû û li van deran jî dizî kiribû. Ew dema betal dima diçû Stenbolê. Di warê teknîkên diziyê de jî pir jêhatî bû. Yek ji wan, teknîka pisîkê bû. Wî bendek bi navtenga pisîkekê ve girê dida, ew diavêt balqonên ku kinc (cil, çek) lê raxistîbûn, pisîkê bi penceyên xwe kincên raxistî dikişandin xwarê.

Hacî Nadir mir, lê neviyên wî hê jî pîşeya wî didomînin. Li xwarê em dixwazin macerayeke wî binivîsin.

Rojekê Hacî Nadir li navdera mala xwe rûniştiye, bi çavekî nebaş li dora xwe dinêre. Dema ew dibîne ku gundiyekî du ga dane ber xwe diçe cot, dibêje: "Wa ye karê me yê îro." Bang li neviyê xwe dike: " Kuro lawo were, karê me yê îro jî derket."

Ew kesê ku diçû cot, Bariyê virker bû. Piştî Barî, Hecî û neviyê xwe jî berê xwe didin dêman (erdê bejî). Di rê de Hecî Nadir ji neviyê xwe re dibêjê: "Kuro ezê xwe bidim pala pêşberî Barî, tu jî xwe di nawelê de veşêre, dema ew hat qesta min tu gayekî ji cot biwerisîne û birevîne."

Hecî Nadir tê cihê ku gotî, bi dengekî bilind "Ez metel (heyirî) im, ez metel im", dibêje. Barî ber bi wî tê, di wê navê de nevî gayekî dibe. Barî ji Hecî Nadir dipirse: "Te xêr e, çima tu metel î?" Hecî Nadir :

–Ez metel im ku tu bi gayekî cot dikî. Barî :

–Na ez bi du gayan dikim.

Dizivire ku tenê gayekî wî heye, ji wî ku gayê din li mal maye, gayê xwe yê heyî dide pêşiya xwe û berê xwe dide malê.

CEWDET QUŞMAN

Mele û nivişt

Rojekê ji rojan li Kerborana Mêrdînê li gundekî jinikek diçe mala meleyê gund. Rûdine û rebenê nizane wê derdê xwe ji mele re çawa bibêje. Mele dibêje: "Xwişka min fedî neke, ez jî wekî birayê te me, çi derdê te hebe eşkere bi bêje." Jinik dest pê dike: "Derdê min pir mezin e, ne tê civatê, ne tê gotinê. Mêrê min her şev heşa ji huzûra te, di cihê xwe de dimîze. Ez hatime ku tu nivişteke çêbikî." Mele niviştekê dinivîse û çêdike, dide jinikê. Û piştre peyva xwe wiha berdewam dike: "Vê niviştê deyne bin balgîva mêrê xwe, heta hefteyekê înşalah wê qenc bibe. "Jinik niviştа xwe bi kêfxweşî dibe û datîne bin balgîva mêrê xwe. Hefteyek derbas dibe. Vê carê mêrik dirî cihê xwe. Jinik diheyire, dibeze mala mele. Mele derî vedike, jinik bêbêhn hêdî hêdî dipeyive: "Mele! ez heyrana şaşika te, ez ketime bextê te, tu bîne ser eyara berê, min qebûl e."

SILAHEDDÎN CÛLEMÊRG

JI BO BÎRANÎNA MIRINA MELE EVDILAYÊ TIMOQÎ ÇEND GOTIN

SERWETA WÎ YA HERÎ MEZIN TÊKOŞÎNA WÎ BÛ

Mele Evdilayê Timoqî tu carî memûrtiya dewletê qebûl nekiribû. 40 salên dawî ya ji jiyana xwe ku bi zanîn û ilm dagirtî jî, li gundê xwe yê Timoq a di quntara çiyayê Helkîsê de avakirî didomîne. Lê nav û dengê seydayê mezin, ji zû ve ji wan sînorên qedexekirî ku bi deh salan lê wehşeta faşîzma SS'an hatibû meşandin, bihartibû.

Mele Evdilayê Timoqî, an jî Mele Evdilayê Xerzî, li dawiya sedsala 19'an li gundê Timoqê ku li ser Hezoya Batmanê ye ji dayîka xwe bûye. Bavê wî Mihemed, ji ber teqwatiya xwe bi navê Sofî Mihemed hatiye naskirin. Di 8 saliya xwe de, dest bi xwendina erebî kiriye. Lê xwendina wî ya li medreseyê, bi derengî, di 18 saliya wî de dest pê kiriye.

Xwendina xwe ya li medreseyê, bi piranî li dorhêla Amedê û li Farqînê domandiye. Demeke kurt jî wî li Sûrî xwendiye. Di demên xwendina xwe de, ji ber ku hînbûn û hînkirin wekî sûc hatiye qebûlkirin, gelek zexmetî kişandiye. Lê Mele Evdille, serî li ber zehmetiyan netewandiye û dîwar û bendên ku li ber zanînê hatine bilindkirin, yek bi yek hilweşandiye. Mele Evdila piştî ku xwendina li medreseyê diqedîne, karê xwe yê melatiyê jî, li Farqînê û li gundên wê dimeşîne. Zewaca wî jî, di demên destpêka melatiya wî de û bi keçeke ji Farqînê re pêk tê.

Mele Evdilayê Timoqî tu carî memûrtiya dewletê qebûl nekiribû. 40 salên dawî ya ji jiyana xwe ku bi zanîn û ilm dagirtîbû jî, li gundê xwe yê Timoq a di quntara çiyayê Helkîsê de avakirî didomîne. Lê nav û dengê seydayê mezin, ji zû ve ji wan sînorên qedexekirî ku bi deh salan lê wehşeta faşîzma SS'an hatibû meşandin, bihurîbû. Wî di nava sînorên qedexekirî de, ji xwe re dinyayeke bi dilovanî ava kiribû. Bexçeya jiyana xwe jî, bi kulîlkên kesk û sor û zer xemilandibû.

MELE EVDILA Û XORTÊN KURD

Li gorî seydayê mezin, xort ronahî û bextewariya rojên pêş bûn, azadî û jiyan bixwe bûn. Lê seyda bi hêzeke din jî dizanibû. Ev hêza tarî, ewrên xwe yên reş ên bi zilm û zorê dagirtî, li ser jiyana mirovahiyê danîbû. Seyda li hember vê tarîtiyê bi hemû hêza xwe têkoşiya û ji ber baweriya wî ya bi xortan hêviya wî tu car nevemirî. Dizanibû ku bi tenê xort dikarin per û baskên vê teyra dirinde bişikênin û qedera miletê Kurd biguherin.

Di sala 1979'an de, rojekê ez û seyda ji ber mektebekê derbas dibûn. Xwendevan hewşa mektebê re dagirtibûn. Mela li zarokan vegeriya û bi dilovanîn wiha got: "Mala min bi qurbana we be. kî dikare bi we?" Min jî xwest ku vê gotina xwe ji min re firehtir îzah bike. Mela wiha li min vegerand: "Dema ku ev xort bi tama (çêja) azadiyê bihesin, tu quwet nikare wan jê bigire."

Ji bo mela li dinyayê rûmeta herî mezin azadî bû. Lê dizanibû ku bidestxistina azadiyê ew çend ne hêsan e. Ji ber vê yekê jî dest dabû xortan ku dinyayê ji kirêtî û gemarê paqij bikin. Seyda ta roja mirina xwe jî di nava xortan de û di vê têkoşînê de bû.

Mele Evdila Timoqî bi kurdên başûriyan re di sohbetê de

KURD BI MELE EVDILLA SERBILIND IN

Seyda bi hezkirina xwe ya ji tebîetê, ji ilm û edebiyatê dihate naskirin. Li gundê xwe, mezraya Xeytikê keşf kiribû û ev mezra bi keda destê wî ji nû ve bi jiyan bûbû. Ji bo mirov bikaribe giranbuhabûna vê vejandinê binirxîne, divê mirov mezraya Xeytikê bibîne û bi ewilê wê jî bizanibe. Bi wî rengî jî ji însanan hez dikir û keda ku dida mirovên li der dora xwe, bi dehcaran li keda wî ya li xwezayê bû. Wisa jî ilmzan bû. Pirtûk ji destên wî kêm nedibûn, ji pirtûkên li ser tarîx, edebiyat, cografya û siyasetê hez dikir. Evîndarê Melayê Cizîrî û Cegexwîn bû. Axaftinên xwe bi helbestên herdu hozanan dineqişand. Bi navê Mele Ehmed mirovekî pirtûka Melayê Cizîrî wergerandibû Erebî. Min ji seyda pirsî ku vê wergerê çawa dibîne. Bersiva wî ev bû: "Ji bo ku ev pirtûk bê wergerandin, 7 profesorên ku di 7 warî de îxtîsas dîtine lazim in. Ji bo bikaribin bi serfirazî wergerînin jî, wextekî direj divê." Serweta wî ya herî mezin edebiyatvanên kurd, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Cegerxwîn û edîbên kurd ew ên din bûn.

Ilm û zanîna wî ya îslamî jî, ji yên ku bi dilrehetî fetwa kuştina insanan didan cihêtir bû. Li gorî wî insan di nava jîndaran de yê herî mukemel, yê herî bi rûmet û yê herî bişeref bû. Wisa qebûl dikir ku dilhiştina insanan gunehê herî mezin bû. Dema wesfên Quranî Kerîm didan, dida zanîn ku Xwedê tê de, ji insanan re riya aştiyê, wekheviyê, têkiliya di nava mirovan de nîşan dide. Afirandina gerdûnê jî lutf û nîmetek e jî insanan re ku jê bi wekhevî îstifade bikin. Bi kurtasî wisa dida zanîn ku di dînê îslamê de kuştina insanan tune ye, lê jiyandina wan heye.

NÎJAD YARUK

QURANA BI KURDÎ

PORTRE

ABDULLAH VARLI

Di avrêla (nîsana) 1939'an de tê dinyayê. Pêşî li ber destê bavê xwe dest bi xwendina erebî dike û di çil rojî de dawî li xwendina Qur'anê tîne. Her wiha wekî hemû feqiyan li ber destê gelek mele û seydayan dersan dibîne. Diçe Sûriyê û li başûrê biçûk di medreseya **Şêx Ahmedê Xeznayê** de xwendina xwe didomîne. Di 12.6.1964'an de li Erdişê dest bi îmamtiyê dike, li vî bajarî wezîfeya muftîtî û waîztiyê pêk tîne. Di gelek saziyên dewletê de wergêrtî û pisporiya pirtûkê kevin dike. Di sala 1993'yan de teqawud dibe. Abdullah Varlı xwendina unîversîteyê qedandiye.

Heta niha gelek kesan Quran bi kurdî şîrove kirine û tevsîra wê çêkirine. Lê cara pêşîn e ku bi temamî li kurdî tê wergerandin (tercûmekirin.)

Ev yek ji aliyê Mele Abdullah Varlı ve pêk hat. Varlı, ji aliyê din ve werger ji kîsê xwe da çapkirin û weşandin.

Lê der heqê ziman rastnivîs, alfabe û gramerê de bû hedefa rexneyan. Zimanekî navçeyî hatiye bikaranîn. Abdullah Varlı daxuyand ku wî devoka mamedî (mehmedîl ya kurmancî bi kar aniye û ev devok li cografiyeke mezin a Kurdistanê tê axaftin.

Varlı, ne bi tenê ji aliyê devoka ku bi kar aniye, ji hêlên din ve jî bal kişande ser xwe. Pirsên ku me der barê xebata wî de lê kirin, bersivandi. Ev divê bê gotin ku, zimanê hevpeyvînê li gorî gramer û rastnivîsa Welatê Me hatiye serriastkirin. Wekî tê zanîn Welatê Me gramer û rastnivîsa Celadet Bedirxan bi kar tîne.

Çi ji we re bû sebeb ku hûn Quranê wergerînin ser kurmancî?

– Gava min dixwend, hinek mamosteyên min doz (îdîa) dikirin, digotine min: "Tu dikarî Quranê wergerînî kurdî." Lê belê min ev hêz, quwet di xwe de nedidît. Piştî ku ez ji xwe re ponijîm (fikirîm), ez gihîştim wê baweriyê. Divê ku her miletek bi zimanê xwe fermana bi qenciyan, parastina ji xerabiyan bike. Kurd di vî warî de bêpar mane. Min va ku ez wê wergerînim, kurd bi zimanê xwe, ola (dînê) xwe hîn bibin, ka ola wan çi ferman kiriye.

Ez ne şaş bim, ev cara pêşîn e ku Quran li zaravayê kurmancî tê wergerandin, ne wisa?

– Min destpêka wergera Quranê de gotiye ka kurd di çi gavê de dest avêtine ku Qurana pîroz wergerînine zimanê xwe.

Di cara yekem de, di 222'yê hîcretê de **Eliyê Sindî**, dest avêtiye, lê belê nivîsandinên wî min nedîtin. **Baba Tahirê Úryanî** jî tiştekî wisa çêkiriye, dîsa min ev jî nedîtin. **Mele Mihemmedê Goyî** çar cild tevsîr çêkirine. Lê mixabin min ev jî nedîtin. Li Kitêbxaneya Misûlê heye, hîn nehatiye çapkirin. Destnivîs e. Di sala 1917'an de dest pê kiriye, heta sala 1923'yan xelas kiriye.

Di vê navê de digotine min ku Bedirxaniyan jî çêkiriye, min nedît. Min yek nemûçe (nimûne) û bînaşeyek (planek) nedît. Min ji ber xwe, dest avêtê. Lê gava yek ji van tune be pir zor e.

Hûn di dawiya wergera xwe de dibêjin ku we ew di sala 1977'an de qedandiye, we çi çax dest pê kiribû?

– Min di 15 salan de qedand. Di sala 1962'yan de min dest pê kir û di sala 1977'an de li Maçkaya Trabzonê min xelas kir. Di vê destpêkirinê de min li pir kitêban, mesela li nêzîkî 1216 tevsîran mêze kiriye.

Tê zanîn dema gelên xaçparêz (îsawî) xwestin Încîlê wergerînin ser zimanên xwe, gelek tiştên ne xweş qewimîn. Digotin *"Încîl pîroz e û divê neyê wergerandin."* **Ji bo wergera Quranê asteng hene, an tê hiştin ku bê wergerandin?**

– Ji bo Quranê jî tê gotin. Di ola mesihiyan de, tiştek heye, çawa ku di olên kevin de jî heye. Kîjan mirov karibe fermana bi qenciyê, parastina ji xerabiyê bike, ewê xwende, ewê ku hatiye perwerdekirin dikare, yanî keşe û dêr dikare vî karî bike. Kesên dinê nikarin. Di dînê îslamiyetê de ev hate rakirin. Her ferd dikare fermana bi qenciyê, parastina bi xerabiyê bike. Gava her ferd bike, divê her ferd bi zimanê xwe bike.

Ev têkoşîn di serê îslamiyetê de dest pê kiriye. Gava kurd ketine nava misilmanan **Îmamê Henîfî** bi xwe gotiye, *"Yekî/ê ku nikaribe bibêje "Allah û ekber" bila bibêje* **'Yezdan buzûktirîn'** yanî Xwedê mezintir. Lê li cem misilmanan, li cem îslamiyetê na, hê ew qedexe heye. Ji kultura xiristiyanî hatiye.

We daye nîşan ku we serî li saziyên dînî yên Tirkiyeyê daye ji bo vekolîna wergerê, lê ji we re bersivek nehatiye, ji ber çi û ji hêla din ve jî we bi serê xwe ev xebat kiriye. Çima bi tenê?

– Divê mirov raqetandina (veqetîna) navbera misilmanî û îslamiyetê bide nîşan. Îslamiyet tiştek e, misilmanî tiştekî din e.

Di îslamiyetê de divê her kes bi zimanê xwe pîrozahiyên xwe bizanibe. Ji bo ku fermana bi qenciyê û parastina bi xerabiyê bîne cih. Lê, misilmanan ev derxistine; ku tu bibî xulamê misilmanekî tu dikarî bibêjî "Ez misilman im." Min jî dêhna xwe dayê ku ez di binê destê muesseseke resmî de bixebitim, wê bibêjin: *"Tu hewcebûnek ji wergerê re tune. Lewma bi farisî heye, bi tirkî heye, bi erebî heye. Kurmanc dikarin ji wan hîn bibin."*

Min bir cem diyanetê da ku lê mêze bikin. Gelo, dibe ji edebê re min tiştekî ne baş gotibe, min mane ne wisa gotibe. Li hember derketin, gotin min ku wergera bi kurmancî dibe tiştekî îdeolojîk, nabe zanyarî (zanistî, ilmî). Wekî din jî gotin ku muesseseyeke me ya ku bi kurdî bizanibe û lêbikole tune ye.

We ev werger pêşkêşî Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel jî kir. Mebesta we çi bû gelo?

– Emê bi 113 kesan ve biçûna cem serokkomar. Lê belê nehatin. Di kurdî de ev cara yekem bû, min dixwest bizanibin ku zimanê kurdî ne zimanekî berber, koçerî bi tenê ye. Bizanibin zimanekî medenî dikare li zimanê kurdî bê wergerandin û me xwest ku em hinek jî tiştên aştiyê jê bixwazin. Saetek û deh deqîqe bi me re mijûl bû. Pir tiştên ku me nizanibûn, em jê hîn bûn. Em heft kes bûn.

Ez dixwazim vêca bêm ser wergerê. We du alfabe bi kar anîne. Alfabeya kurdî ya latînî û ya erebî. Lê em bala xwe didinê ku we hin herfên alfabeya tirkî di ya kurdiya latînî de xebitandine. Ji ber çi?

– Min bi zanebûn wisa kiriye. Heya niha kurdan 6 alfabe xebitandine.

Alfabeya sorî, mixî (bizmarî), zend-awestî, pêhlewî, alfabeya sir a ku êzîdî dixebitînin û di pey de jî ya erebî xebitandine. A niha jî ya latînî dixebitînin.

Di alfabeya pêhlewî û zend-awestî de dengê "p" *(par)* yanê sala çûyî, "ç" *(çav)*, herfa "xeyn" hatiye xebitandin. Ereban bi tenê ew deng nexebitandine. Herfeke kurdî ye û divê hebe.

Hûn xwe zimanzan dihesibînin? Li aliyê din, di sala 1932'yan de Celadet Bedirxan hîmê alfabe û rastnivîsa kurdî daniye. Hûn wî heqî di xwe de dibînin ku bi serê xwe herfekê lê zêde an jî kêm bikin?

– Niha zimanê kurdî ku bi yek alfabeyê bê xebitandin, wê gavê dibe zimanê dugelî (dewletê). A niha tiştekî wisa nîn e. Ji ber ku min ji wan pirtir lêkolîn li ser alfabeya kurdî kiriye, zêdetir ez gihîştime vê guherandinê. Ji ber ku ew deng di qirika kurdan de heye, min ew xebitandiye.

Der heqê rastnivîsê (îmlayê) de we ji xwe re qaîde çêkirine, an jî hûn li ser şopa kesekî çûne?

– Min zêdetir alfabeya **Kamuran Bedirxan** ji xwe re kiriye rêber. Lê alfabeya wî li Tirkiyeyê guheriye. Ketiye rûçikekî din. Ew alfabeya ku wî xebitandiye niha tune ye. Mesela **Ekrem Cemîl Paşa,** Tarîxa Kurdistanê, bi zimanê kurdî nivîsiye û bi wê alfabeyê nivîsiye. "Xwe" wekî **"xue"**yê nivîsiye. Min dev ji wê berda. Paşê hinek hevalan **"w"** jî pê re nivîsîne.

Ez bawer dikim di nivela min û wan de cudatî tune. Tenê, di hûnandina peyvan de heye. Hinek caran jî di peyva **"Xuda"** de heye. **"Xweda"** şaş e. Ji ber ku di nivîsên kevin de **"Xuda"** bêyî **"w"**yê hatiye nivîsîn. Mane jî xerab dibe. "Xuda" ereb jê re dibêjin "Reb". Gava **"Xweda"** be maneya **"Xwedaçêkirinê"** jê derdikeve.

Yanî hûn dibêjin ev du peyvên ji hev cihê ne û tu eleqeya wan bi hev re nîn e.

– Belê, çimkî yek tê maneya xwe afirandinê (Xweda) û ya din jî tê maneya sahiba bi erebî.

Em dibînin ku, ji aliyê teşe (şekil) ve hevgirtinek di navbera peyvan de nîn e. Hûn ji vê yekê re çi dikarin bibêjin?

–Ez dibêjim qey di maneyê de hûn negihîştine, ji ber wî. Mesela **"tû"** heye **"tu"** heye. Bibexşîne, **"tû"** tê maneya tifkirinê.

Ez dikarim nîşanî we bidim. Wekî *"Xûda"* **û** *"xuda"*, *"ruhnî"* **û** *"rûhnî"*, *"de"* **û** *"da"*... **Nimûne dikarin bêne zêdekirin.**

– Belê hindik in. Dibe ku xeletî çêbûbûn. Wê bêne rastkirin. Hûn rast dibêjin.

Gelo, hûn di warê îmla û gramerê de ji xwe ewle bûn ku we bi vê rewşê ev werger da çapkirin?

– Ez bi pir mirovan re li ser van mijûl bûme. Hê jî êpêy nivîsandinê min hene. Bi vê yekê ne. Ez bi van qaîdeyan bawer im û ezê wan nivîsên xwe jî bi wan bidime weşandin. Ez ji xwe bawer im ku min wiha nivîsiye.

Em dibînin ku ew alfabeya erebî ya ku li gorî zimanê kurdî hatiye çêkirin û ji aliyê kurdên başûr û rojhilat ve tê bikaranîn, we ew nexebitandiye. Çima?

– Min ew alfabeya kevin xebitandiye, ya ku li medreseyan dihate hînkirin. Ew alfabeya ku li nava kurdên Iraqê tê xebitandin, zêde ne bikêrhatî ji bo zaravayê Behdînî. Di cihê wî de min zehf zor daye xwe. Min ser û jêr û ber danine. Yanî xêzek daniye jorê, ev "e" tê xwendin, yek daniye binî, ev "î" tê xwendin. Mesela gava **Ehmedê Xanî**, nivîsiye, bi vî şeklî nivîsiye.

Der heqê wergerê de tu rexne, çi erênî û çi jî neyînî ji we re hatin?

– Belê ez li hêviya wan im. Ne rexneyên bêzanîn, ku bibêjin "Te navê suretan rakiriye, te xerab kiriye, te navê Yezdan guherandiye". Na, divê rexne rê jî nîşan bide. Bi devkî hin tişt ji min re hatine gotin, min bersiva wan daye.

Ev cara pêşîn û xîm (hîm)ek e. Dibe ku tê de kêmasî, hişkî, şaşî hebin. Lê belê di cara duduyan de cara sisiyan de, di cara çaran de wê hêdî hêdî kêmasiyên xwe temam bike.

Bi ya we zimanê wergerê çawan e?

– Bi ya min zimanê wê ji bo kurdê niha giran e. Lê belê min ferhengokeke biçûk li para ve daniye, ku lê binihêrin.

Hevpeyvîn:
ZANA FARQÎNÎ

WERGERA QURANÊ Û MALA HEFTSERÎ

"Mala bêserî" an jî **"mala heftserî"**, ev gotinên pêşiyan çiqas li rewşa civaka me tên. Pêşiyên me, dema ku der heqê tiştekî de, tevlîhevî, geremol, sergêjahî û hwd. hebûye, ev gotin bi kar anîne. Ji ber ku ji her seriyekî dengek derketiye, bêrêxistinî (organîzasyon) hebûye...

De îcar rewşa me ya di warê nivîskî de jî ev e. Di destpêka salên 1930'yî de **Celadet Bedirxan** (di gel kêmasiyan) rabûye em kirine xwediyê alfabeyekê, rastnivîsekê, gramerekê. Bi gotineke kurt di vî warî de ji me re hîmek, bingehek daniye. Lê em qîma xwe pê naynin, radibin ji nû ve alfabeyekê çêdikin, rastnivîsekê çêdikin û pê berhem û nivîsên xwe pêşkêşî gel dikin. Xwe bêhemta û hempa diyar dikin. Bi carekê xebatên ku berê hatine kirin, şaş û çewt îlan dikin.

Tê xuyan ku bêmetodiyek, bêserûberiyek di nava me de heye. Ji dêla ku em bi wê alfabe û rastnivîsê, fikr û nêrînên xwe, pêşniyazên xwe yên der barê zimên de pêşkêş bikin, em wan mehkûm dikin.

Piştî van gotinan, divê ku mirov li ser wergêra Quranê bisekine. **Mele Abdullah Varlı** ew bi navê **"Quran a Pîroz û Arşa wêya Bilind"** daye weşandin û hem jî îbareya bi tirkî **"Kur'an-ı Kerim ve Kürtçe Meali"** li seriya navê wê yê bi kurdî daniye.

Lê cihê dax û mixabinê ye ku, di vê xebatê de gelek kêmasî û şaşî hene. Hîn di serî de gava nivîsa wî ya bi navê **"JÎNAMİN"** (ku der heqê jiyana xwe de nivisiye û diviya bi vî awayî bûya; JÎNA MIN) tê xwendin, ev rewş bi hemû zelaliya xwe tê dîtin.

Heke em bi xalan (maddeyan) rewşê diyar bikin.

1. Di alfabeya kurdî ya latînî de xebitandina herfên tirkî: Herfên ku di alfabeya me de nîn in wekî **"ü"** û **"ğ"** ya tirkî, hatine bikaranîn. Di nivîsa bi navê "JÎNAMİN" de, di paragrafa pêşî de hevoka, *"Dîya min di Meha Ağustosê diroya cejna Remezanê da 1945 da mir"* û di paragrafa çaran de hevoka, *"Di sal a 1976 da Hükümet ê ez şandime (Maçka) bajarekî ji nîvça (Trabzon)êye"* jî vê yekê re wekî nimûne dikarin bi rehetî werin dayîn.

2. Di alfabeya tirkî de xebitandina herfên kurdî: Ji vê rewşê re jî herfên mîna **"x"**, **"î"** û **"q"**yê em dikarin bidine nîşan. Ji eynî nivîsê emê nimûneyan bidin. Ji paragrafa çaran, hevoka *"Di sal a 1993 da Xalq Kültüri araştırma Genel Müdürlüğüna bûme Daîre Başqanî"*.

3. Di kurdî de xebitandina terkîbên tirkî: Dîsa ji wê nivîsê, paragrafa çaran nimûneyên *"bûme Daîre Başqanî"*, *"ez emeklî (keddar) bûm"* û ji paragrafa pêncan *"xandina min di Türkiyede jî Üniversîte mezûnîme"* dikarin bên dayîn.

4. Bikaranîna devoka navçeyî: "Wergêr, ji serî heta binî devoka navçeya xwe bi kar aniye. Ew devoka ku ji bo nivîskî hatiye hilbijartin û îro hema bibêjin hemû kes pê emel dikin, wergêr silav jî lê nekiriye. Di gel vê yekê, zimanê wergerê zehf dijwar e.

Ji bo vê jî hema em wergera ayeta pêşîn bidin:

–Ferkera Vekerok (1) cuz 1). Ferkera Vekerok.

Di Mekê da Hatîye Hinartin ê Heft Beratene.

Bi Nav ê Yezdan ê Dilo wan

ANALÎZ

ê Dilovîn (Dest Bixwendinê Dikim)

1. Çiqas pisindan û sipasî hene! hemîşk ji bona Yezdan ê Xûda yê cihanêrane.

2. dilovan ê dilovîn ewaye.

3. (Ewa) serok ê roya xelat û celatane.

4. Em hey xurî ji te ra perestî dikin û hey em ji te arîkarî di xwazin.

5. Tu me bîne ser riyarast.

6. Ewanê te bi wan qencî kirine hene! ewa rîya wane. Rîya wan kesne te li wan xeşimkirîye, nîne û rîya wan kesne, ku tû ji wan bi xeşmî hêrs bûyî jî nîne û (rîya wankesne) rêwunda û rêwundanok bi xweber jî nîne.

7. (Tu evan dilxwazîne me litê bi ke)

5. Rastnivîs: Wergêr, jixweber rastnivîsek afirandiye. Lê bêpergal (sîstem) e. Bi xwe re dikeve nakokî û dijberiyê. Qaîdeyên ku danîne, hev nagirin. Carinan qertafa (pirtikê) tewangê (**ê**) bi peyvê re carinan jî jê cihê dinivîse. Wekî "Ferkera Vekerok Di Mekê da Hatîye Hinartin ê Heft Beratene".

Ger qertafên veqetandekê "**a**," û "**ê**" jî bi peyvê re, geh jî cuda dinivîse: Ji wergera bi navê **"Ferkera Vekerok (1) cuz (1)"** xala yekemîn *"Çiqas pisindan û sipasî hene! hemîşk ji bona Yezdan ê Xuda yê cihanêrane."*

"ji bona Yezdan" û *"Xuda yê cihanêrane"* du hevokên biçûk in û di ya pêşîn de herfa "**a**"yê û di ya duduyan de jî herfa "**ê**"yê veqetandek in. Yek zayendiya mê û yek jî ya nêr temsîl dike. Di hevokê de wezîfeya wan yek e.

Qertafên lêkera "bûn"ê geh bi peyvê re, geh jî jê cuda tên xebitandin. Ji bo nimûne, ji "JÎNAMİN", paragrafa pêşîn *"Ez Abdullah Memê kurê Mehmet (Hoko)* ***me****. Ewa jî kurê Mele İbrahîm* ***e*** *ji binamala Xanyan* ***e****"* û ji paragrafa duduyan *"Ez hevt salî****bûm*** *min, li bal bav ê xwe di gundê (Nenecanî) da, di çil royî da Quran xand dawya wê anî."*

Ji aliyê din ve daçekên mîna **"bi", "li", "jî"**...ku têne pêşiya peyvê û **"da", "ra" "jî"** ... ku têne paşiya peyvê, geh bi wan ve û geh jî, ji wan cihê nivisîne. Ez hewce nabînim ji wan re nimûneyan bidim

Peyva **"Xweda"** bi hêsanî dikare bi awayê **"Xûda"** û **"Xuda"** bên dîtin, her wiha cînavka kesane ya duyemîn (ya ji desteya netewandî) **"tu"**, **"tû"** jî dikare bê tespîtkirin. Du herfên dengdêr li cem hev hatine danîn, bilindek hatine bikaranîn û hwd.

Bi kurtasî, der heqê rastnivîsê (îmlayê) de tiştekî pak nikare bê gotin.

6. Gramer: Jixwe, wergêr tu bala xwe nedaye gramerê. Dibe ku haya wî jî jê nîn be. Herkes dizane ku axaftina bi zimanekî û pêzanîna wî ne eynî tişt e. Yek tenê dikare pê bipeyive, binivîse û bixwîne, lê zimanzan êdî zanyarê zimên e. Ilmê wê dizane û bi her awayî dikare endam û hêmanên wê terîf bike.

Heke bi ziman zanibûya, jixwe wê rastnivîsa wî têkûz û dirust bûya. Ji ber ku eleqeya rastnivîsê bi gramerê re heye.

Werger, Abdullah Varlı, alfabeya erebî ya ku kurdên başûr û rojhilat niha pê emel dikin, bi kar neaniye. Varlı alfabeya erebî ya ku berê li medreseyên kurdistanê dihate xebitandin, bi kar aniye. Tê zanîn ku bi wî halî zimanê kurdî nikare bê nivisîn, ji ber ku hin dengên kurdî tê de nîn in. Ji bo nimûne: **ê, i, o, û,** ...

Nimûne bi taybetî ji nivîsa wi ya bi navê "JÎNAMİN" hatin dayîn, ji ber ku neynika (eynika) wergerê bi xwe bû. Di pêşgotina xwe de çi ziman bi kar aniye, ji bo weargera ayetan jî eynî ziman bi kar aniye.

ZANA FARQÎNÎ

'Wê ev bihar ne wekî tu biharî be'

Ji qumandarên ARGK'ê Şoreş, daxuyanek da ajansa Kurd–A'yê Li gorî vê daxuyaniyê Dewlet dixwaze ku di biharê de operasyonên mezin bike. Li çiyayê Gabarê bi niyeteke wisa dest bi operasyonê kirin lê ew bi ser neketin. Li gorî daxuyaniyê, çiyayê Gabarê di bin kontrola gerîla de ye. Şoreş di daxuyaniya xwe got ku êdî kes bi hêsanî nikare têkeve Botanê û ewê îsal zorê bidin herêmên rizgarkirî. Di dawiya daxuyaniyê de, "Wê ev bihar ne wekî biharên din be." tê gotin.

15.2.1995

Li Hezexê, li gundê Bafê gerîlayên ARGK'ê kesek bi navê İbrahim Koç kuştin. Tê gotin ku wî karê kontratiyê dikir û ji bo vê yekê hatiye kuştin.

Sercerdevanê Dêrikê, Şerif Temeli li ser gundên navçeya Dêrikê cerdan pêk tîne. Gundî cerdevaniyê qebûl nakin û ji ber zora hêzên dewletê û cerdevanan gundên xwe vala dikin.

Hêzên dewletê û gerîlayan di Newala Bunisra ya Nisêbin de şer kirin. Di heqê mirî û birîndaran de salox tune ne.

Sekreterê HADEP'a Seyhanê Ahmet Karatekin ji aliyê polîsên sivîl ve hate binçavkirin. Malbata wî ji jiyana wî biendîşe ye.

16.2.1995

Roja 14'ê reşemiyê minîbûsa cerdevanan di riya Kaşuriyê de li mayina gerîlayan qelibî. Cerdevanek mir, yek jî birîndar bû.

Trektorek di riya Dihê de li mayinê leqitî. 5 gundî birîndar bûn. Der heqê meqseda xistina mayinê de agahî neketin destê me.

Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser gundê Misifra Dihê . Gerîlayan 7 gundî bi xwe re birin. Kesên kugerîlayan birine; Bayram Özkan, Mehmet, Hacı, Mahmut Güneş, A.Kadir Dayan û Abdullah Sevgin in. Hate gotin ku, van kesan alikariya dewletê kirine û gerîlayan ji ber vê yekê ew birine.

17.2.1995

Hêzên dewletê li çola gundê Şaşê ya Dihê dest bi operasyonê kirin. Li gundê Şaşê di navbera gerîlayekî û leşkeran de şer derket. Gerîla mir, der heqê mirî û birîndarên hêzên dewletê de agahî neketin destê me.

Li Kercewsê hêzên dewletê bi şev derketina derve qedexe kirin. Cerd û operasyonên binçavkirinê li navenda Kercewsê didomin.

Gundê Ecibê û Garê yên girêdayê Kercewsê ji aliyê leşker û cerdevanan ve hate şewitandin. Beriya demeke kurt herdu gund hatibûn valakirin.

18.2.1995

Hêzên dewletê berê operasyona xwe didin aliyê çiyayê Gabarê, mintiqeya Mişarê. Li mintîqeya Mişarê gerîlayan leşker xistin kemîna xwe. Di kemîna gerîlayan de 12 leşker û gerîlayek mirin.

Li Sêrtê hêzên dewletê haziriya operasyoneke mezin dikin. Tê gotin ku 120 erebeyên leşkerî ji Sêrtê çûne mintîqeya Haruna.

Li Bismilê operasyona binçavkirinê didome. Hêzên dewletê du kesên bi navê Mansur Şahin û M. Şirin Aslan xistin binçav.

19.2.1995

Gerîlayên ARGK'ê di navbera Şirnexê û Cizîrê de kemîn avetin pêşiya leşkeran. Di kemîna gerîlayan de 18 leşker mirin, 7 leşker birîndar bûn.

Di navbera Nisêbînê û Midyadê dê gerîlayan rê girtin. Di dawiya rêgirtinê de gerîlayan helîkopterek xist. Der heqê mirî û birîndaran de agahî nekete destê me.

20.2.1995

Li Stewra Mêrdînê, li gundê Avîna di navbera gerîlayên ARGK'ê û leşkeran de şer derket. Di şer de uzman çawuşek û 8 leşker mirin, gelek leşker birîndar bûn.

Hêzên dewletê ji ber êrîşên gerîlayan li dora gundê Mêrdinê Danterê dev ji operasyonê berdan. Di êrîş û kemînên gerîlayan de 6 leşker mirin, gelek birîndar bûn.

21.2.1995

Li Berwariya Sêrtê, li mintiqeya Garisan gerîlayan êrîşî leşkeran kir. Der heqê mirî û birîndarên hêzên dewletê de agahî tune ne.

Hêzên dewletê li Dihê dest datînin ser darên gundiyan. Gundiyên Dirişka û Bizika ji ber cerd û pêkutiyên hêzên dewletê nikarin darê xwe bifiroşin.

Li Êlihê, 5 kes ji aliyê polîs û timên taybet ve hatin binçav kirin. Kesên ku hatine binçavkirin Hatice, Evîn, Zekî Bahadır û Ali, İsmet Kırmızıtaş in. Maliyên wan ji jiyana wan endîşeyê dikin.

22.2.1995

Jinikeke dîn ji aliyê leşkeran ve hate kuştin. Roja 21'ê reşemiyê leşkerên qereqola Akdemirê ew jinik gulebaran kirin û kuştin.

Li Mazrayê, li navçeya Arıcakê, li nişteciheên gundên Bircik, Ekrekê û nehiya Birikê ji bo ku ew cerdevaniyê qebûl bikin, zilm û pêkutî tê kirin.

Hêzên dewletê ji bo operasyonê li Xozatê mewkiya Aliboğazı dicivin. Ev 3–4 roj in sewkiyata leşkeran û cebilxaneyê didome.

Navenda Nûçeyan

ERNK têkiliyên xwe yên fermî xurt dike

Roja 16'ê reşemiya 1995'an li ser navê nûneriya ERNK'ê yê Yekîtiya Dewletên Serbixwe Ahmet Dere û Rûstem Broy li payitexta Belû Rusyayê (Rusya Spî) Minsk'ê têkiliyên dîplomatîk danîn.

16'ê reşemiyê hevdîtina pêşî bi cîgirê Wezîrê Karê Derve Kucinski Viktor re çê bû. Di hevdîtinê de nûneriya ERNK'ê bi giranî li ser polîtîkaya Komara Tirk ya Kafkasê sekinî. Li ser vê mijarê cîgirê wezir bersivand ku ew jî li polîtîkaya Komara Tirk çavdariyê dikin û beriya mehekî du dîplomatên tirk bi sedema casûsiyê ji wir hatine avêtin.

Di dawiya hevdîtinê de cîgirê wezîr ji bo têkiliyê kefxweşiya xwe diyar kir û berdawama hevdîtin û têkiliyan xwest. Dîsa eynî roj bi endamên hikûmetê serokê Belû Rusyayê re, Berpirsiyarê Pirsgirêkên Taybet Cepkala Valerî re hevdîtinên nûneran domiyan. Ahmet Dere, li ser dostaniya gelê Kurd û gelê Belû Rusyayê axavtinek kir û memnûniyeta xwe anî ziman.

Navenda Nûçeyan

Tirkiye silehên NATO'yê dide Azeriyan

Rojnameya Norwecî "Klasenkampen" di hejmara xwe ya roja 18'ê reşemiya 1995'an de dibêje silehên ku Tirkiye ji dewletên NATO dikire an jî ew hîbeyî Tirkiyeyê dikin, ji bo ku azerî wan di şerê navbera azeriya û ermen de bi kar bînin, dide azeriyan.

Li gorî rojnameya rojane, ew silehên ku Tirkiye ji dewletên NATO kirîne di şerê Karabaxê de hatine tesbîtkirin. Tesbitkirina wan silehan bi wêneyên ku di şer de hatine kişandin û bi numeroya silehên ku ketine dest, tê îspatkirin.

Ev xeber ji aliyê muxabîrê Özgür Ülkeya ku hate girtin Ronî Alasor ve hatiye amadekirin. Agahiyên li ser vê mijarê ji rapora serbazêkî îngiliz ku ji wezîriya xwe ya karê derve re şandiye, hatiye standin. Vê nûçeyê li der dorên NATO'yê tesîreke mezin kir.

Navenda Nûçeyan

SHP û CHP zewicîn

Roja 19'ê reşemiya 1995'an SHP û CHP bûn yek . Piştî qerara yekbûnê SHP'ê xwe fesh kir. Hikmet Çetin bû serokê partiya yekbûyî.

Gelek roj in li Tirkiyeyê raya giştî bi yekbûna van partiyan tê meşgulkirin. Li gorî qerarên wan, gerek e 28'ê rêbendana 1995'an ev yekbûn çêbûya. Lê tê zanîn ku, ev yekbûn bi sedema pirsgirêka serokatiya giştî di wê tarixê de pêk nehat. Piştî ku ev pirsgirêk nehate çareserkirin, qerareke nû standin û kongre taloqî roja 19'ê reşemiyê bû. Di navbera van 20 rojan de li ser navê Hikmet Çetin li hev hatin û pirsgirêka serokatiya giştî ji bo demeke kurt be jî çareser kirin. Lê piştî wê, îcar jî li ser navê partiyê dûbendî kete navbera wan. Dawiya dawiyê ji bo vê yekê jî li ser hilbijartinê li hev hatin.

Roja 18'ê reşemiya 1995'an SHP û CHP ji bo navê partiyê di nava xwe de hilbijartin çêkirin. Di hilbijartinê de CHP'ê 1003 rey SHP'ê 635 rey standin. Dawiya hilbijartinê SHP'ê xwe fesh kir. Hikmet Çetin bi reyên endeman herdu partiyan ji bo serokatiya giştî ya CHP hate hilbijartin.

Navenda Nûçeyan

www.kurdistan.org

Sala Ehmedê Xanî ji aliyê kurdan ve bi çalakiyên cur bi cur tê pîrozkirin. Di şahiya NÇM'ya Edeneyê de Koma zarokan, "Şitlên Azadiyê" bi marşa neteweyî, Ey Reqîb dest bi programê kir, bi stranên gelêrî û neteweyî dilê beşdaran geş kir.

Sala Ehmedê Xanî li Edeneyê jî hate pîrozkirin

NÇM'ya Edeneyê ji bo pîrozkirina sala Ehmedê Xanî, dest bi çalakiyên xwe kir. Roja 19'ê reşemiyê ji bo geşkirina sala Ehmedê Xanî li NÇM'ya Edeneyê şahiyek li dar ket. Nêzî 300 kesî beşdarî vê şahiyê bûn. Serokê NÇM'ya Edeneyê Hasan Kaya bi axaftineke kurt pîrozbahî vekir. Wî di axaftina xwe de bal kişand ser wateya salê û wiha da zanîn ku ew çalakiyên bi rengî wekî raporeke xebatkarên navendê dibînin. Serokê NÇM'ya Edenê got ku wê ji mehê carekê çalakiyên bi vî rengî li dar bikevin.

Pişt re, koma zarokan, "Şitlên Azadiyê" bi marşa neteweyî, Ey Reqîb dest bi programa xwe kir û di gel hinek stranên gelêrî û neteweyî dilê beşdaran geş kir. Teatra Yekbûnê bi şanoya xwe ya bi navê Xewna Şewitî –berhama xelatgirtî ya Jan Dost, Koma Rewşen jî bi stranên xwe yên xweş tevî şahiyê bûn.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ
EDENE

ÇÎROK

PEQIKÊN BARANA BIHARÊ

Serê şefeqê Mihoyê Gurî bangî jina xwe kir. Got: "Eyşê xwe girê de, emê biçin rezê xwe. Divê em hebek cot û merdan bikin." Eyşê jî xwe girêda. Nan û hinek xwarin xist tûrê xwe û da pey mêrê xwe. Berê xwe dan nava rez. Mihoyê Gurî ji xwe berê gurî bû, di serê wî yê gurî de jî çil rûvî didan lotikan. Niyeta dilê wî xerab bû. Armanca Miho ya zewaceke din hebû. Lê ji ber ku jina wî hebû û jina wî Eyşê jî pir delal bû, ji alî gundiyan ve dihat hezkirin, Miho newêribû wê ramana xwe eşkere bike. Got: "A baş ew e ku ez Eyşê bikujim. Wê çaxê ez keça kê bixwazim wê bide min. Kes nabêje: "Em keça xwe nadin ser hewiyê."

Rewşa Miho qet nediket serê Eyşê. Berê Miho jê hez dikir, lê niha her tim Miho bi serê pozê xwe pê re xeber dida. Eyşê di nava van xem û xeyalan de li pey mêrê xwe hêdî hêdî dimeşiya.

Li nava rez, hîn nû dest bi karê xwe kiribûn, ewrekî reş û tarî xuya bû. Baranê hûrik hûrik dest pê kir. Ji bo ku xwe ji baranê biparêzin, çûn hundirê xaniyekî ku ji bo mahserê çêkiribûn. Rûniştin, li benda sekinîna baranê man. Miho ji xwe re got: "Ji vê gavê çêtir keys tune ye?" Ji nifşekê ve destê xwe xist qirika Eyşê. Eyşê li ber xwe da û xwe ji nava destê Miho xelas kir. Got: "Kuro ma qey tu dîn bûyî, dilê te bi çi heye?" Miho got: "Wele ezê te bikujim. Em li vir tenê ne. Kes jî me nabîne." Bi vê gotina xwe careke din xwe çeng kir û destê xwe xist qirika wê. Eyşê destê wî girt û got: "Tu min bikujî mafê min ji te re namîne. Birayên min wê te bikujin." Miho got: "Ma wê kî zanibe ku min tu kuştî ye?" Wê gavê belengaza Eyşê di nava destê Miho de bêmecal mabû. Li derve barana avrêlê kortik tije av kiribû û bi ketina hebên baranê re peqik çêdibûn. Eyşê got: "Ma kes nebîne jî ev peqikên baranê li te mikur bên." Ev peyvên wê yên dawî bûn. Gurî destên xwe jidandin. Eyşê di nava destê wî de bêrû ket erdê.

Sal derbas bûn. Gundiyan kesekî ne zanibû ka rebena Eyşê ji aliyê kê ve hate kuştin. Miho ji nû ve zewicîbû. Zarokên wî çêbûbûn. Rojek ji rojên demsala biharê meha avrêlê baran hûrik hûrik dibariya. Miho û tevî jina xwe ya nû li ber deriyê mala xwe sekiniye. Li baranê difericin. Gotinên Eyşê yên dawî hatin bîra wî û keniya. Jina wî got: "Miho tu bi çi kenî?" Miho nexwest ku rastiya sedema kena xwe jê re bêje. Got: "Wele ez ne bi tiştekî kenîm." Lê ev ji jina wî re bû mereqeke pir mezin û dev ji Miho berneda. Miho xelasiya xwe nekir, rabû rastiya xwe jê re got. Li xwe mikur hat.

Çend roj derbas bûn, dengê wî û jina wî hat. Şer kirin. Jinikê bazda derve. Derket ser xênî û kir hewar: "Hahoo! hahoo! Miho Eyşê kuştibû, hahoo!" Ev qêrîn kete guhên gundiyan tev. Ê ku rahişt darê xwe, yê ku rahişt kevirê xwe û berê xwe dan mala Miho. Deng ji kesî dernediket. Ber mala wan tije mirov bûbûn. Keç û xort, kal û pîr, heta bi zarokan.

Kesên ku dereng pê hesîbûn, hîn dihatin û dicivîn. Dengek ji hundir hat got: "Biçin tirba wî bikolin."

Çawa ku tu xerabî veşarî û bêheyf û tol nemabûn ev xerabiya Mihoyê Gurî jî jê re nema.

MAMOSTE
BEDRAN BÊNAV

KELEPOR

Çand îfadeya kesbûnê ye

Eger tu bixwazî miletekî ji holê rabikî, ne bi kuştinê, lê bi jiholêrakirina çanda wî, tu dikarî vî karî bikî. Bêguman ev herdu cumleyên jorîn, ewqas eşkere dikin ku çand û kesbûna mirovan, mîna hestî û goşt girêdayê hev in. Mirov nikare wan ji hev cuda bike. Dîroka çandê bi qasî dîroka însên kûr e, ji civaka yekemîn û heta îro, tim û tim, di têkoşîna însan ya li hemberî zoriya sirûştî ye de, herwiha bi kedeke bêdawî hatiye afirandin.

Bêşik, tê fêmkirin ku di giyana însanan de, çand hemû terzên jiyanê, liv û rengê giyana civakan e. Çand; urf û adet in, hal û hereket in, danûstandina bi hev re ne, heyîna ku civakê nirxandiye, huner û edebiyat e û hwd. Her civakê li gorî xwe taybet û reng daye çanda xwe. Her milet bi çande û heyînên xwe ji hev cuda hatine naskirin. Ji zimên heta war û rengejiyanê. Herwiha, mirov dikare bibêje, kesbûna civakan, piştre jî kesbûna ferdê ku endamê civakê ye, li gorî wê çandê hatiye şekilkirin. Yanê, çand îfadeya kesbûnê ye, kesbûn jî şeklê çandê ye."

Formuleke felsefî heye, wisa dibêje: "Hin gelên ku parastina çanda xwe nekiribin, gelên mezintirîn bin jî, tim û tim, bi hêsanî gelên din karin wan ji holê rakin." Bêguman gelek nimûne jî di dîrokê de hene. Herwiha ev formula berdewam dike: "Hin civak jî hene ku nirxên xwe yên çandî, neteweyî bêkeftûleft, bêkar û ked qezenc kirine, îşte ew civak ên ku piyaseya aborî, bi hin riyên bêked anîne holê, dema serdest dibin, ew dibin xwediyê karekterekî talanker, kedxwar." Bi vê gotinê, rewşa ku civaka me tê de dijî û karekterê mêtingerên ku li ser civaka me sitemkariya xwe berdewam dikin, hin jî baştir tê fêmkirin. Dema mirov kûr bifikire, gelo, ji berî nehsed salî, dema ku tirk ji rojhilatê hatibûn Mezopotamya û Enedolê, wan bi xwe re çi çand anîbûn? Çiqas ked dabûn da ku nirxên civakî "neteweyî" biafirinîn? Çiqas medeniyet û avahî ava kiribûn?"

Em vegerin ser mewzûya xwe ya kesbûna civakî û rengejiyana kesbûnê ya di warê çandî de. Bêguman her mirovê li welatê me, pir an hindik jî hin hîkariyên (tesîrên) mêtingeriyê de para xwe standiye. Niha xala ku mirov li ser raweste û vepije jî ev e. Ew hîkarî û texrîbata ku dijmin li ser çanda me kiriye, kesbûna me çiqas ji rastiya me ya neteweyî bi dûr xistiye, herwiha di vî warî de çi ji me re divê?

Bêguman ji ber zexîmbûna meşa tevgera azadiyê ye ku îro civaka me ji nû ve xwe diafirîne. Di vê meşa rizgarî û azadiyê de, bêşik hemû birên civakê girêdayê hev in. Rizgarî û afirandin, hemû taybetiyên civakî jî bi vê kerwanê ve girê didin û didin meşandin. Heke mirov bibêje: "Piştî serxwebûnê emê hînî çanda xwe bibin... piştî azadiyê emê hînî zimanê xwe bibin.. piştî xelasiyê emê..." ev gelek çewt û şaş e.

Îro afirandina ewqas nirxên giranbuha, bi ked û fedekariyên pir mezin, rastiya me bi me daye qebûlkirin. Êdî tu kes nikare bibêje ku derfet û nimûne tune ne da ku ew jî xwe rast bike. Nirxên ku tevgera azadiyê ava kirin ne hindik in. Pir mixabin ku, di warê çand û hunerê deînsanên me pêşketin û ku têkoşîna ku gelê me derxistine holê şîrove nakin. Eger mirov li vî aliyêînsanên me binêre, gelek kêmasî hene. Zor pêwist e ku rexnekariyeke sererast ji bo pêşketinê derkeve holê.

Di vî warî de roleke mezin dikeve ser milê nivîs û weşanê, hunermend û hozanvanan, berpirsiyar û pêşengên civakî. Ên ku xwe rewşenbîr dibînin û xwe di çanda neteweyî de berpirsiyar dibînin, girîng e li ser vê rewşê hê jî xurtir rawestin.

XELÎL XEMGÎN

Sonda neteweyî û îdeolojiya fermî

Îdeolojiya kemalîzmê, rewşenbîrên tirk fêmkorî kirine. Bûne wekî hespên dengê. Riyek ji wan re hatiye nîşankirin. Li ser vê riyê dimeşin, ha dimeşin. Der û dora xwe nabînin.

Xewnên mirovan jî bi qasî jiyana wan kor in. Jiyana kemalîstan jî, bi Misak–i Milliyê (Sonda Neteweyî) hatiye tixûbkirin. Xewn û xeyalên wan bi vê sonda nebixêr û bêkêr sînor bûne. Bi berçavka vê sondê li bûyerên dinyayê dinêrin. Ji ber vê ye ku, ji riya zanistiyê, ji riya aqil, bi dûr dikevin.

Di vê nivîsê de cih tune ye ku em qala hemû çewtiyên wan bikin. Emê bes li ser yekê rawestin.

Dibêjin: "Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ji her beşî gel û çand hene. Îngilîz, îspanyol, îtalî, yewnan, îrlandî ji van hinek in. Van neteweyên cur bi cur bi hev re yekbûnek pêk anîne. Di vê yekbûnê de zimanê fermî (resmî) yek e. Ew jî îngilîzî ye. Dewlet jî yek e. Ew jî DYA ye. Li wir tu kes xwe bi navê gelê xwe nade naskirin. Hemû dibêjin: "Ez amerîkî me." Ger her neteweyek doza zimanekî, an doza welatekî bike, pêşketin, heta DYA bixwe jî namîne.

Li Tirkiyeyê jî, tirk, kurd, ereb, laz, çerkez û hwd. hene. (Berê wisa nedigotin. Li gorî wan bes tirk hebûn û herkes tirk bû. Diviyabû herkesî fêza xwe bi tirkbûna xwe bianiya) van gelan bi hev re Komara Tirkiye pêk anîne. Navê Komara Tirkiyeyê ne navekî nijadî ye. Herkes wekhev e. Tu kes ji kesî zêdetir ne xwediyê tu mafî ye. Ji kurdan parêzer, dadger, bijîşk, parlamenter, general, serokwezîr heta serokkomar hene. Xêrnexwaz û dilnexwaz ji yekîtiya me eciz in, dixwazin me bêhêz bihêlin. Dest diavêjin kurdan, kurd jî bi wan dixapin."

Ku mirov, bi şiklê îdare ya îroyîn û dîroka Amerîkayê û bi dîroka kurdan û têkiliyên kurdan û tirkan yên dîrokî nizanibe, ev demagojiyeke mezin e.

DYA, tevî parzemîna (qita) Amerîkayê ji sala 1492'yan bi vir ve ji aliyê Ewrûpiyan hatiye keşfkirin. Kristof Kolombê Portekîzî û Amerîgo Vespuccî jî ji Floransayê li kêraxên Amerîkayê gerîne. Keşîş Martin Waldeemuler bi navê Atlasa Batlumjûs atlasek afirandiye û navê Amerîgo Vespucci li vê reşahiya mezin daniye.

Ji sedsala 15'an heta serê sedsala 20'an ji Ewrûpa, pêl bi pêl koçer hatine bakurê Amerîkayê . Erdê fireh, biber; birçî û taziyên Ewrûpa dikişand. Ew ne li dû welatekî, ew li dû dewlemendiyê digerîn. Helbet ew erd ne bêxwedî bû. Dagirkerên Ewrûpayî dest bi qirkirina rûniştvan û xwediyên vî welatî kirin. Trajediya çermesoran tê zanîn.

Pêla koçberiya yekemîn di sedsala 15'an de dest pê kiriye û 300 salî dewam kiriye. Bi vê pêlê re, ji Îspanya, Îngiltere, Fransa, Almanya û ji Swêdê koçer hatine. Di sala 1776'an de DYA ji destê îngilîzan azad bûye.

Paşê pêla koçberiyê ya duyemîn dest pê kiriye û wê jî 350 salan dom kiriye. Bi vê pêlê re, pirtirîn îrlandî hatine. Bi pêla sisêyan re; alman, polonî, macar, rûs, swêd û norwecî; paşê îtalî û yewnaniyan koç kirine.

Di sala 1920'an de riya koçê hatiye birîn. Gava George Washington bûye serokkomar (1790), nifûsa Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê çar milyon bûye, îro hejmar gihîştiye 260 milyonî. Ji 260 milyon kesan hejmara xwecihen xwerû bes 2 milyon in. Ango xwediyê welêt nemane, welat ketiye destên dagirkeran û wan bi hev re yekbûnek pêk anîye.

Divê bê dîtin ku;

1. Navê DYA ne navê miletekî ye, navê erdekî ye. Ango navê cografyayê ye.

Navê Tirkiye, ne navekî cografîk û xwezayî û şirîkatiyê ye, navê gelekî ye.

2.DYA ji 50 eyalet–dewletên federal pêk hatiye, federasyon e.

Komara Tirkiyeyê, yek dewlet e (unîter)

3. Li Amerîkayê zimanê fermî, bi qebûlkirina herkesî îngilîzî ye. Belê tu ziman ne qedexe ye. Radyo, televizyon û rojnameyên herêmî bi her zimanî hene. "Dengê Radyo ya Amerîkayê" bi nêzî 30 zimanan weşanê dike.

Li Tirkiyeyê bes zimanek tê naskirin, yên din qedexe ne.

4. Li DYA'yê 22 milyon kesên ku bi îspanyolî diaxivin hene. Xebat heye ku îspanyolî bibe zimanê fermî yê duyemîn.

5. Gelên li Amerîkayê dijîn her yek, li derveyî Amerîka xwedî dewleteke serbixwe ne. Tu daxwaz û pêwistiya dewletekê ji wan re tune.

6. Di nava gelên Amerîkayê de wekhevî heye. Pêşketina aborî (pir–hindik) wekhev belav dibe.

Lê Komara Tirkiyeyê kurd; bêkar, birçî, xizan hiştine.

Mirov dikare mijarê zêdetir dirêj bike. lê belê bes e. Ên kurdan dixapînin ne dijmin û dilnexwazên tirkan in. Ên gelê tirk dixapînin û dixwazin gelê kurd bixapînin dûvikên îdeolojiya fermî; kemalîzmê ne.

OSMAN ÖZÇELİK

JI RAYA GIŞTÎ RE

Roja 21.02.1995'an Komîsyona Amadekar a Parlamentoya Kurdistanê ya Sirgûnê (PKS) civîna xwe ya çaremîn li dar xist û der barê rewşa Kurdistanê de pêwist dît ku vê daxuyaniya jêrîn biweşîne.

Ji Gulana 1994'an ve li başûrê Kurdistanê şerekî bêrawest di navbera YNK û PDK'ê de berdewam e, em wekî Komîsyona Amadekar nerazîbûna xwe ji bo vî şerî diyar dikin. Ev şer ziyaneke gelekî mezin digihîne berjewendiyên gelê me. Hêzên di nava vî şerê hundirî de rê li ber windakirina hebûna federalî vedike. Em vî şerî protesto dikin û yekser rawestandina şer daxwaz dikin.

Tu caran nayê înkarkirin ku destê dewletên dagirker û yên mezin di vî şerê hundirî de heye. Lê belê helwesta hêzên di şer de bi berdewamkirina şer tenê îfadeyeke wisa dide ku ew ji wan dewletên dagirker re dibin alet. Kesên ku vê rastiyê nebînin ew li hemberî dîrokê bi sûcekî mezin radibin.

Dîsa berdewamkirina şer hêviya gelê me ya ji bo azadiyê dişikêne, di dinyayê de îmajeke wisa dide ku gelê me nikare bi xwe, xwe îdare bike. Ev jî ne mafê tu hêzan e ku gelê me li pêşiya çavan biçûk bikin û bêhêz bihêlin.

Em wekî Komîsyona Amadekar a Parlamentoya Kurdistanê ya Sirgûnê bêqeyd û şert hema yekser rawestandina vî şerî birakujiyê dixwazin. Ji hemû rêxistinên kurdî tê xwestin ku hemû pirsgirêkan di nava xwe de bi şêweyekî aştî çareser bikin. Di serî de jî divê îmkan ji parlamentoya federal re werin peydkirin, ji bo ku bikaribe wezîfeya xwe ya neteweyî pêk bîne û rola xwe bileyize.

Parlamentoya Kurdistanê ya Sirgûnê
Komîsyona Amadekar
21.02.1995

Teyrê Sîmir di çîrokên kurdî de cihekî mezin digire.

Ji çîrokên gelêrî kurteçîrokeke kurdî ya karekterîstîk

TEYRÊ SÎMIR Û GOŞTÊ ÎNSÊN

Carek ji caran, rehmet li dê û bavên guhdaran. Xortekî qewilî, zembîldest, hêja û bixîret hebû. Bavê wî û damariya (jinbava) wî pir zengîn bûn. Bav hingî dixebitî nexweş ket. Roj, meh sal derbas bûn, bav baş nebû.

Xort gund bi gund, bajar bi bajar li dermanekî digeriya. Bi şev ji xwe re li daristanan û şikefta dima. Simbêlên gênim diqeşirand û genimê ter dixwar.

Şevekê ji nişka ve erd hejiya û xort ket bine heft tebeqeyê erdê. Çawa çavên xwe vekirin, dît ku li welatekî xerîb e. Dest bi gerê kir. Li malekê bû mêvan. Lê mazûban tev xemgîn bûn. Xort xwe ranegirt ji wan pirsî: "Çi bi we bûye?"

– Mepirse birawo. Li vî welatî kaniyek heye. Ziyayek ketiye çaviya wê. Her hefte keçekê dixwe, hê rê dide ku em avê ji xwe re bînin. Sibê dora keçika me ye.

Dotira rojê xelkê tev meşk û satilên xwe hildan û çûn ser kaniyê. Xort jî çû. Keçik hatibû xemilandin, lê rondik (hêstir) dibarandin. Dinya li ber çavê wê reş û tarî bûbû. Xort temenî li keçikê kirin. Di tenişta kaniyê de xwe di cihekê de teland. Keçik ber bi devê kaniyê ve çû, deng li ziya kir:

– Bi pêş ve were, bêwijdanê bêwijdan, bêbext. Vê gotinê ziya bihêrs kir. Ziya çawa êrîşî keçikê kir, xort ji nişka ve bi şûrê xwe ajotê serê. Bi şûr ew parçe parçe kir. Piştî kuştina ziya, xelkê şahiyek li dar xist. Dîlan girtin. Piştî şahiyê li xort teklîf kirin ku bibe serokê wan. Xort xwestina wan qebûl nekir. Gote wan ku dixwaze here welatê xwe û çîroka xwe ji wan re got.

Kalekî şertê derketina ji dinyaya tarî ji xort re got.

– Teyrekî Sîmir heye. Bîrindar e. Divê tu jê re şîrê şêr bibî. Heke teyr rehet bibe wê te derxe dinyaya ronî.

Xort dest bi gerînê kir ku şêrekî bibîne. Tu deverek namîne ku naçê. Carekê li daristanekê dibîne ku şêrekî lingên xwe rakirine û zarîn û zivîna wî ye. Xort birîna şêr diqelêşe, kêm jê dikişe. Lingê wî baş dibe. Şêr: "Ey mirov xwestina xwe bibêje." Xort: "Ji min re şîrê şêr lazim e."

Xort şîr ji şêr distîne û tîne ji Teyrê Sîmir re. Teyr xort li pişta xwe siwar dike û wiha dibêje: "Min çiqas got "qîq" tu parçeyek goşt biavêje devê min. Teyr dest bi firê dike. Her çaxa ku dibêje "qîq" xort parçeyek goşt diavêje devê teyr. Qederekê wisa diçe. Goşt diqede. Teyr dema dibêje "qîq" xort parçeyek goşt ji hêta xwe dike û diavêje devê Teyrê Sîmir. Lê Teyrê Sîmir naxwe. Ji ber ku bêhna mirov jê tê. Di dawiyê de Teyrê Sîmir xort ji heft tebeqeyên binê erdê derdixe roniyê. Deng li xort dike û dibêje: "Xorto êdî tu dikarî peya bibî." Xort peya dibe. Teyr ji bin zimanê xwe parçeyê goştê hêta xort derdixe û bi birîna wî ve dizeliqîne, paşê wiha dibêje: "Tu caran goştê mirovan nayê xwarin. De here ji te re oxir be."

Xort, derman ji bavê xwe re nabîne. Ji ber ku êşên ji ber nezaniyê , zû bi zû baş nabin.

Çîroka me çû diyaran, rehmet li bavê hazir û guhdaran. Ji xeynî mar û mişkên qulên dîwaran.

Berhevkar:
JÊHAT GIMGIM

AZADÎ

Welatê Me

ABDURRAHMAN DURRE

Xwendevanên hêja, nêzîkî du-sê mehan ez li Kahîreyê bûm. Beriya mehekê, ez zivirîm Ewrûpayê û min dît ku pîştî 'Welat'a min a şîrîn, rojnameyeke nû "Welatê Me." Wekî gula Newrozê ji xunçeya azadiyê bişkiviye. Ev gul ji nû ve kete destê min. Wekî bilbilê dil-bikul, min li dora wê xunçeyê perawêzên azadî û dilşadiyê danîn. Hêstirên dilxweşî û şadiyê di ser de rêtin û got:

Şukur dîsa li zozanan, gula azadî bişkivî

Kulîlka destê hozanan, bi bilbil re ku axivî

Dilê bilbil ji nû şa bû, bi wê xunça ter û taze

Ku ew sorgul ji nû rabû, Welatê Me Serfiraz e

Bi ser de hêstirên şadî, ji xwîna dil dibarînim

Ji cerda derdê bêdadî, wekî bilbil bi zarînim

Piştî ku ez hatim Ewrûpayê jî, min firsenda xwe nedît ku ji qunçikê "Azadî"yê re binivîsim. Ji ber ku di nava komîsyona amadekar a "Parlamentoya Kurdistanê li Derve" de min jî cih girtiye. Barê xebateke pir giran û girîng ketiye ser milên me. Belkî di hişê hinek xwendevanên hêja de, ev xeyal jî derbas bûbe: "Gelo Seyda çima nanivîse qey em ji bîr kirine yan nexweş ketiye? Tiştek hatiye serê wî; miriye, maye; çi lê bûye ?" Bi rastî heqê wan jî heye ku wilo bifikirin...

Lê ez ji xwendevanên hêja re vê mizgîniyê didim ku; heta Kurdistan azad nebe, ez ne dimirim ne jî nexweş dikevim. Beriya 30 salî min ji Xwedê ev daxwaz û niyaz kiriye ku ez heta sala 2002'yan nemirim û heta wê demê jî ez bawer dikim wê Kurdistan azad bibe. Ev bû 30 sal ku Xwedê ev daxwaza min bi cih aniye. Ji sala 2002'an re mane 7 sal. Înşallah heta wê demê ez namirim, wê Kurdistan azad bibe. Pîştî wê jî Xwedê kerim e. Êdî mirin tê, nexweşî tê, çi tê bila bê. Ezraîl jî bêminet e. Lê beriya azadiya Kurdistanê ez tu tiştî qebûl nakim. Bila kekê Ezraîl jî xwe newestîne, ez zû bi zû jê re serî danaynim!

Ma meseleya jibîrkirinê, ew jî nemumkûn e. Lewre mirov welatê xwe û gelê xwe piştî mirinê jî ji bir nake. Welat û gel; qibleya mirov in, baweriya mirov in. Ew dil û canê, dîn û îmana mirov in û tu car nayên jibîrkirin.

Welat, qibla dil û can e, ezel de

Min bêrî dayê

Xebat, lê dîn û îman e, tebat, bê wî

Li dil nayê

Li we hemû xwendevanên hêja, li hemû kurd û Kurdistanê, li Welatê Me, li azadiyê pir silav û spasî û evîndarî û dildarî... Her bijîn.

Şanoyeke nû:

CIVATA KULÎLKAN

Wekî hatiye nasîn; Şano canê milet e. Di dirêjiyê demên dîrokê de ew tenê ye ku êş û bûyerên civakî hildide tengaka wêjeyê û bi rengê tirajediyê yan jî komediyê dide nîşan.

Lê mixabin ev celeba wêjeyî ya hêja û pêwist, di wêjeya Kurdî de pir kêm e û dazanîna sedema vê yekê lêkolîneke kûr û dirêj divê.

Lê di van demên dawî de em karin bibêjin: Xebateke bingehîn di warê şanoya kurdî de pêk tê. Lê bi ahengeke kin û bi kavinên teng.

Lewre em şanoya Civata Kulîlkan ya helbestvanê hêja M. Hemo wekî mizgîneke şahiyê dibînin. Ji bo du sedeman:

1– Şano, celebeke wêjeyê ye ku cihê wê di wêjeya kurdî de qels e.

2– Ev şano ji bo zarok û mindalên kurd hatiye nivîsandin. Ev mindal qelesbûneke kûr di mafê xwe yên wêjeyî de dibînin. Rast e mindal biçûk in, lê karekî mezin ji wan re divê.

Civata Kulîlkan şanoyeke stranî ye, bi hevpeyvîneke zelal, li ser zimanê kulîlkan hatiye azadkirin.

Digel şanoya Civata Kulîlkan deh helbestên mamoste X.Remo yên ji bo zarokan hene. Ew helbestên hanê bi rengekî hesan û bi zimanekî xweş û bi kêşeyeke sivik hatine nivîsin û girîng e her zarokek ji zarokên kurdan ji ber bike

Di dawiyê de em karin bejin ku ji bilî wan kêmasiyên akademîk di warê şanoyê de û di warê wêjeya zarokan de, Civata Kulîlkan wê roleke baş bilîze di wêjeya zarokên kurd de.

M. BÊKES

DAYIKA NANPÊJ

Bişev û roj bi xebatî
Li karî dayîka nanpêj
Jîr û çeleng û jêhatî
Bi ar î dayîka nanpêj

Dikeve ber tenûra har
Bixwêdan û bikar û bar
Dîsa nîvtêr jar û hejar
Bêzar î dayîka nanpêj

Keda salekê ye arvan
Dike hevîr û dike nan
Bo bicuwe nîn e diran
Neçar î dayîka nanpêj

Xeftan lê diqulibîne
Daw, delingan diçikîne
Tu rojeke xweş nabîne
Hejar î dayîka nanpêj

Tenûra te ji axa sor
Bi kotek û gelek bi zor
Bi saya wê dike abor
Bindar î dayîka nanpêj

Geh nanê tirş geh jî qursik
Geh şikeva û geh tewik
Hevîre rehn nanê şilik
Zanyar î dayîka nanpêj

Te nediye rojek xweşî
Tu nakenî nabeşişî
Te borandin rojên reşî
Û tarî dayîka nanpêj

Dinya te tenûra vêl e
Tifik û dustan û sêl e
Xwe bêşol û kar nehêle
Tu carî dayîka nanpêj

Tu bûyî barkêşa derdan
We hemû dayîkên kurdan
Ne zevî ne rez û erdan
Bêwar î dayîka nanpêj

Xaniyê te hişkeberî
Bin seyandiye bi herî
Tu li rewşa xwe nanêrî
Xemsar î dayîka nanpêj

Li te nayê neke girî
Geş be bi rûyê vekirî
Çêke nanê kuncîkirî
Bihar î dayîka nanpêj

Temen giha heftê salan
Bi derd û axîn û nalan
Dil ji te birin bi talan
Dildar î dayîka nanpêj

Tu pîr î lê dil ciwan î
Bi kul û derdê giran î
Dayîka Jîr Dilovan î
Tu yar î dayîka nanpêj

FERHENGOK

Qursik: Nanê biçûk
Nanê tirş: Nanê bi hevîrtirş çêkirî
Nanê tewik: Nanê sêlê
Nanê şilik: Nanê bê hevîrtirş ku bi sêlê çêdibe
Vêl: Ne kur
Tifik: Agirdan, şomîne
Dustan: Sêpêyê hesinî
Hişkeber: Dîwarê bêkils û bêxerc
Beşişîn: Bişirîn

JÎR DILOVAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Çare berxwedan e

Hevalên delal... Berpirsiyar û xebatkarên rojnameya Welatê Me yên birêz, îro (3.1.95) hejmara 10'an ya Welatê Me gihîşt destê min. Ez bi dil û can ji we re spas dikim û xebata we ya birûmet pîroz dikim.

Birayên hêja, gava min gotara heval Mazhar Günbat xwend hêstirê min bêkêfa min hatin xwarê. Ji ber zor û zilma ku li gelê me tê kirin, cîhan derbasê sedsala 21'an dibe, em hîna di nezaretxaneyan de bîr û ramanên xwe tînîn ziman. Lê birayên hêja em çi bikin ku qedera me wiha ye, vêca li hemberî vê qedera reş çare tenê berxwedan e. Ji ber ku berxwedan jiyan e... Dest bi dest di riya berxwedanê de ji bo welatekî serbixwe û azad. Hûn bimînin di xweşiyê de û silavên germ ji Mazhar, Aynur û Suut û hemû xebatkarên Welatê Me re.

Mohamad Marwan Suleyman
Nîs / Yugoslavya

Me xwestekek heye

Hevalên di redaksiyona Welatê Me de rojbaş! Berî her tiştî em silavên hevaltiyê li we dikin û serkevtinê ji bo we dixwazin. Bi rastî berî demekê, min nameyek ji we re bi rê kir û di wê de bersiva xaçepirsa hejmara 1'ê, da. Lê ji bîr nekin ku ez bersiva her hejmarê didim. Ez li vir dixwazim nêrîneke xwe bînim ziman. Birastî wekî ku tê zanîn, hemû xwendevanên li dewletên dûr Rojnameya Welatê Me gelek bi derengî digihîje destê wan. Lewra divêt ku hûn li van tiştan binêrin. Min ji hejmara 1'ê heya 7'an mêze kir ku xelat bes tenê li Kurdistana bakur û Tirkiyê tên belavkirin. Gelo qey name ji derve ji we re nayên? Belê gelek tên, lê gelekî biderengî. Ji ber derengbûna posteyê ez dixwazim bêjim ku xelat divêt bi rengekî din were belavkirin. Ew jî divê bi vî rengî be, "5 xelat li Kurdistana bakur û 5 xelat jî li kurdên cîhanê."

Hevalên giranbuha; ji bîr nekin ku ez ne tenê bersiva xaçepirsê didim. Ez bi xurtî li ser Rojnameya Welatê Me disekinim. Ez dixwazim ji we re bidim zanîn ku pirtûka nivîskar Jan Dost em jî dixwazin ku bixwînin û ev xwesteka me ye.

Xortên YXWK'ê yên li bajarê Xarkovê

Welatê Me, hebûna me ye

Ez xwendevanekî Rojnameya Welatê Me me. Wexta Welatê Me derket, ez pir kêfxweş û dilşa bûm. Bi derketina Welatê Me, min xwe hîn baş nas kir.

Pir tişt li ser ziman hatine gotin, ez jî dixwazim du gotinan li ser zimên bibêjim. Ez bawer im ku, mirovek bi zimanê xwe nizanibe nikare gelê xwe, welatê xwe û xwe baş nas bike. Ji ber vê yekê em li mala xwe, li nava hevalê xwe, bi zimanê xwe biaxivin. Em gava wisa nekin wê zimanê me were jibîrkirin.

Gerek e zimanzan û welatparêz bi alîkariya Rojnameya Welatê Me zimanê xwe bidin xwendin û nivîsandin.

Her tişt ji bo jiyaneke nû.

Kevirê Çiya/ Pirîn

Ji Welatê Me re

Bi weşana te em pir kêfxweş bûn. Xebatkarên Welatê Me peywira xwe bi cih anî. Dor hatiye ser xwendevanan.

Gelî Kurdan!

Gava guftugo û xeberdanan (peyvînan) em dibêjin; "Hejmara kurdan 25–30 milyon e. Divê vê hejmara mezin em di xwendina kurdî de jî bidin diyarkirin. Divê em kêfa dijminên xwe bi xwe neynin. Geşbûna Welatê Me mirina wan û hevalbendên wan e.

Welatê Me bixwînin û bidin xwendin. Welatê Me rûmeta me ya herî mezin e.

İhsan Yüce / Amed

Bi hêviya welatekî azad

Hevalên hêja; Ez sala we ya nû bi hêviya welatekî serbixwe û azad pîroz dikim. Di karê we yê birûmet de serkeftinê dixwazim.

Ez bihêvî û bi bawer im ku sala 1995'an (Sala Ehmedê Xanî) bi her awayî wê bibe sala rizgariya kurd û Kurdistanê.

Silavên germiya welat li ser we be. Bixêr bimînin.

Mêhyedîn Aksın / Wan

Şehîdê me rûmeta me ye

Gelî xwendevan û xebatkarên Rojnameya Welatê Me, em bi dilekî germ silavan li we hemûyan dikin.

Em dixwazin rastiyekî bînin ziman. Di ola me de, ji bo kesên di ber mafê xwe û welatê xwe de li hemberî zilm û zordariyê şer bikin û werin kuştin ji wan re şehîd tê gotin. Îro li Kurdistanê şerekî gemarî dewlet li hemberî gelê kurd dike.

Gelê kurd li ber vê zilma dewletê xwe diparêze. Keç û xortên kurdan di vî şerê de ji bo welatê xwe şehîd dibin. Di rojnameya we de ji şehîdan re "mirin" an jî "hatin kuştin" tê gotin. Gerek e ji wan re şehîd bê gotin. Ew li gorî ola me şehîd in.

Bimînin di xweşiyê de.

Azad û Serbixwe/ Mêrdîn

www.arsivakurdi.org

JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

Xebatên şexsî

Qurana ku li kurdî hate wergerandin, ev demek e haya me ji vê xebata Birêz Mele Abdullah Varlı hebû û me hêvî dikir ku bi kurdiyeke Kurdistanî ya ku hemû kurd jê fêm bikin û îstîfade bikin hatibe wergerandin. Roja ku ev berhem derkete piyaseyê, ji bo em wê bixwînin, me bêderengî ew peyde kir.
Cara pêşî ku me ew xwend, zimanê wê ji me re pir giran, tevlîhev û herêmkî xuya kir. Me got, dibe ku ev ji kêmasiya me be, em westiya bin û me ew bi awayekî baş nenirxandibe. Ji ber ku me îhtîmal nedida ku berhemeke bi keda 15 salan hatibe wergerandin ji aliyê zimên ve ew çend qels be. Ji ber wê yekê bi rojan em li ser sekinîn. Me çend carên din hin pasaj jê xwendin, li ser zimên û naveroka ayetan me dîtina hin kesên din ên pispor û eleqedar pirsîn. Bes mixabin tevî hemû çakbîniya (optîmîstiya) xwe, me kêmasî û çewtiyên ku ji wergêrekî nayê hêvîkirin, tê de dîtin.
Ji bo wergêriyê pêwist e mirov hem zimanê jê tê wergerandin, hem jî zimanê ku lê tê wergerandin ji hemû aliyan ve gelek baş zanibe. Wekî din, gerek e li ser teknîka wergerê jî zanîneke mirov a kûr hebe. Em ji aliyê maneyê ve, rastbûn û nerastbûna wergera ku Varlı kiriye datînin aliyekî, ji ber ku ew nakeve warê me. Tenê em dixwazin li ser kurdiya ku tê de hatiye bikaranîn çend tiştan bibêjin.
Di berhemekê de pêşgotin û biyografî beşên herî fesîh in. Lê hê di nivîsên pêşgotin û danasîna jîna Varlı de em rastî zimanekî dijwar, tevlîhev û kêmasiyên pir mezin tên. Mesela, hevokek (cumleyek) ji beşa **'JÎNAMÎN'** wiha ye: *"Ji dervaê xandina mine erebî, xandina min di Türkiyede jî Ünüversite mezûnîme".* Ji beşa pêşgotinê jî em hevokeke ketûber bidin: *"Birano! Ji ber îdî komalê biyanê Kurd jî tevê Kurda bûne, bazara Kurdan hatîye dar xistinê, Kurdan peyvne wusa elewat û sodret aferandine: Bi giştî ne Kudîne, nejî Kurdîne diliqî mane."*
Ev hevokên li jor em nizanin li gorî kîjan pîvanan hatine nivîsandin. Gelek mînakên wisa di pêşgotinê de hene. Helbet eynî hevokên ji aliyê rêziman, îmla, sentaks û morfolojî ve çewt, di wergera ayetan de jî hatine bikaranîn. Li aliyê din, alfabeya ku birêz Varlı bi kar aniye ne ya tirkî ne jî ya kurdî ye. Li vê derê ez pêwist nabînim mînakên din ên çewt bidim, ji xwe di rûpela me ya 9. de nivîseke ji aliyê mînakan ve dorfireh li ser wergera bi kurdî cih girtiye. Divê bête zanîn ku em hurmetê ji keda Varlı re digirin. Lê ji ber ku wî di amadekirina vê berhemê de di warê kurdî de zêde şexsî hereket kiriye, bi tu saziyên kurdî neşêwiriye û di qeydeyên rêziman û îmlayê de Celadet Bedirxan îhmal kiriye û ji ber wê yekê jî gelek çewtî di kurdiya wî de hene, em xwe mecbûr dibînin ku rexneyan lê bigirin. Eger her kesekî ku li ser ziman dixebite, rabe li gorî xwe alfabe, îmla û rêzimaneke cihêreng bi kar bîne, hingê yekkirina zimanê kurdî û pêşvebirina wî nemumkûn e. Di warê zimên de gelek ji me xwedî çewtî û kêmasî ne. Kêmasiyên bêhemd, teknîk û bêzanebûn hene ku ew dikarin bêne telafîkirin. Lê eger mirov ji xwe pêştir tu saziyên din otorîte qebûl neke û heta, pêwist nebîne bi wan bişêwire, hingê rewş diguhere. Heta van salên dawî, saziyên kurdan tunebûn, berhemên li ser zimên jî herkesî nikaribû peyde bike, lê îro êdî rewş guheriye. Enstîtuyên me hene, rojnameyên me hene û berhemên ku wekî otorîte tên pejirandin jî hene di hêla zimên de. Ev ziman ne yê şexsekî an jî çend şexsan e, ew yê neteweyekî ji milyonan pêkhatî ye. Ji ber vê yekê jî mafê tu kesî tune ku qeyde û rêzikên zimanê gelekî li gorî dilê xwe xera bike.
Eger hin qeydeyên xelet hebin di alfabe û rêzimana Celadet Bedirxan de, an jî we hin tiştên bikêr û nûjentir afirandibe di vî warî de, werin em bi saziyên xwe bişêwirin, em bi hev bişêwirin da ku em bi hev re dev ji hin tiştan berdin û dest bi yên din bikin.

Rûmeta mirovahiyê

Di civaka kurdan de, çil-pêncî sal berê, însan bi pereyan dihate nirxandin. Buhayê wî/wê li gorî dewlemendbûnê dihate pejirandin. Başbûn û xerabiya mirovan li gorî feqîrî û maldarbûnê dihate pîvan.

Dema mirov maldar û dewlemend bûya bi başî, feqîr û bêmal bûya bi xerabî dihate binavkirin. Lewre di vê demê de bi piranî ev peyv dihate gotin: "Li gorî pereyên xwe bipeyive, an jî li gorî hêza xwe bipeyive..."

Îro di rojeva civaka kurd de têkoşîna rizgariya neteweyî cihekî girîng digire. Bi nêrîna min mirov divê kesan yanî rewşenbîr, hunermend, demokrat, sosyalîst, welatparêz û hwd. li gorî "rûmet"ê binirxîne. Divê mirov di civaka xwe de bi rûmeta xwe bê qebûlkirin.

Rûmet, di têkoşîna neteweyî de cih girtine. Mirovê ku ji bo mafê gelê xwe di vê rêxistinê de cihê xwe nestîne, nikare bibêje: "Ez demokrat im, sosyalîst im, ronakbîr im" û hwd. Rewşa gelê me li ber çavan e. Lewma bi kurtasî dibêjim, divê mirov li gorî rûmeta xwe bipeyive.

Abdullah Dağ
Serokê HADEP'a
Mêrsînê

Li ser misilmaniyê û kurdan

Heke îro kurd bindest bin, di vê bindestiyê de fêmkirina misilmaniyê jî tiştekî girîng e. Ji bo ku kurdan baweriya ol herdem li pêşiya neteweya xwe dîtine û girtine. Ev yek doh jî wisa bû îro jî wisa ye.

Çima ol tesîreke halo li kurdan kiriye? Gelo di eslê olê me de tiştekî halo heye? Gava mirov van pirsan ji xwe dike, bersiv "na" ye. Ji bo ku zehfên gelên misilman bi felsefeya misilmaniyê gihane rizgariya xwe. Nexwe çima li me tesîra ol wiha bûye. Ew rizgar kirine, em bindest kirine. Sebeba yekemîn, kurdan bi erebî nizanîbû, ji ber vê yekê rastiya îslamê baş fêm nekirine. Ya duyemîn, rastiyên îslamê ji wan re berevajî hate gotin: "Gere em ji bo axê şer nekin, tiştê lazim ûmet e. Tirk, ereb û ecem jî misilman in, çênabe em şer bikin û xwîna misilmana birijînin." Tiştê ku ez dixwazim bêjim: " Ev ne misilmantî ye." Ji ber ku pêxemberê delal Hz. Muhemmed wiha dibeje: "Aliyê xwe li aliyê mazlûman deynin." Ev hedîsa şerîf rûyê xayinê ku peşrûya (maske) misilmaniyê didine ber rûyê xwe, xweş nîşan dide.

Ez dixwazim ji we re mîsalan ji Îslama esîl bidim; wekî ku em dizanin îtalyanan Libya îşgal kiribûn, beriya Şerê Dinyayê yê Yekemîn. Lê gel bi her awayî li ber xwe da. Di bin serokatiya Ömer Muxtar de. Di taliyê de, Îtalyanên dagirker çare nedîtin û bi Ömer Muxtar re rûniştin ser maseyê. Muxtar qet tavîz neda. Serokê heyeta Îtalyan dibêje: "Muxtar tu halo bikî wê şer bidome û gelek xwîn birije. Bila xwîn nerije, bila aştî hebe."

Ömer Muxtar dibêje: "Erê dilê min jî dibêje aştî, lê mirovahî dibêje li ku, kî bikeve axa te, pê re şer bike." Misilmaniya esil û heya ji me re aniya ber çavan, qenc û pîs danîne rex hev; qencî li qencan, pîsî li pîsan. Gotina talî: Yê ku dayika wî ya niştiman di bindestan de be û xwe nelebitîne bênamûs be.

Rolan Akdoğan
Kerboran

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
☐ 3 Meh	☐ 400.000 TL	☐ 35 DM
☐ 6 Meh	☐ 800.000 TL	☐ 70 DM
☐ 12 Meh	☐ 1.600.000 TL	☐ 140 DM

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

NAV Û PAŞNAV : .....
NAVNÎŞAN : .....
.....

Navnîşana Welatê Me
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel–Fax: 2491344 – 245 29 91

WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÜNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
Metin AKSOY

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ

Redaktor
Sami TAN

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî
(Halkla İlişkiler Müdürü)
Rıza Fişek

NAVNÎŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL–FAX
249 13 44 – 245 29 91

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÛNERÎ
(Temsilcilikler)

Suriye– Jan Dost
Fener Rojbiyanî
Berlin– Silêman Sido
49-30-69 00 26 95
Bonn– Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
Hannover– Selîm Biçûk
49-5721-813 60
Hamburg– A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
Munchen– Mahmut Gergerli
49-871-670 884
Badenwurttenberg–
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
Swed– Amed Tigris
46-8-740 69 81
Amsterdam– Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
Parîs– M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
Atina– Sîrwan Reşîd
Bekır Bahoz
30-1-3634905

BI EMÎN ALTUN, BAVÊ CENGÎZ ALTUN RE HEVPEYVÎNEK

'YEK BÊ KUŞTIN, WÊ ÇAR RABIN ÇAR BÊN KUŞTIN, WÊ DEH RABIN'

"Wexta ku bêne min, bê çawa yekî din jî bê dewsa min, wê herine wî jî. Însanekî ku xelkê xwe hez bike, gerek e zanebûna xwe jî bixe bin xizmeta gelê xwe."

Cengiz Altun, di 24'ê reşemiya (sibata) 1992'an de li Batmanê ji aliyê kontrgerîla ve hate kuştin. Wê demê di Rojnameya Yeni Ülke'yê de mûxabîrtî dikir. Wî, beriya ku bê kuştin, li ser kontrgerîla û hizbûllahê vekolîn çêdikirin û çend nivîsên wî jî li ser wan di rojnameya Yenî Ülke'yê de derketibûn. Ji ber xeberên wî hêzên tarî jê nerehet bûn û ew kuştin.

Bi rasthatina salvegera heftiya şehîdbûna Cengiz, bi bavê wî Emîn re me sohbetek kir. Me xwest em Cengiz ji devê wî guhdarî bikin û hin aliyên wî yên ku baş nayên zanîn, hîn bibin.

Ji ber ku hûn bavê Cengiz Altun in, ji me baştir wî nas dikin. Hûn dikarin behsa wî ji me re bikin?

– Cengiz, ne ji ber ku kurê min e ez dibêjim, dikaribû di ber xelkê xwe de gelek tehde û zilmê bidîta. Wexta ku çû lîseyê, hê bêhtir xwe nas kir. Piştî xwe nas kir, xwest ku bi qelema xwe xizmeta gelê xwe bike û bi bawerî bû rojnamevan.

Cengiz (li orteyê) di 26.3.1991'an de, bi hevalên xwe yên unîversîteyî re tê dîtin.

Wê wextê wî hem li universiteyê dixwend, hem jî di rojnameya Yeni Ülkeyê dixqebitî. Diçû li hin gundên ku tê de cerdevan hebûn digeriya, tehde û zilma ku li gundiyan dihate kirin, di rojnameyê de dinivîsandin. Herhalde gelek însan jê nerehet bûbûn û paşê rabûn ew kuştin. Cengiz ne însanekî ku wekî hinekan xortaniya xwe, ciwaniya xwe bigire ber çavên xwe û xwe bide aliyekî bû. Ê wî hinek fikrên wî hebûn. Carekî min got: "Cengiz kurê min, vêga hinek tu hatiyî belîkirin, di rojnameyê de hinek xeberên te derketin, berî ku zirar bê te, ez bim ezê xwe bidim aliyekî." Ji min re got: "Wexta ku bêne min, bê çawa yekî din jî bê dewsa min, wê herine wî jî. Însanekî ku xelkê xwe hez bike, gerek e zanebûna xwe jî bixe bin xizmeta gelê xwe."

Cengiz beriya ku şehîd bikeve, zehf tehdît li wî dihat kirin. Ji ber çi Cengiz ji Batmanê venediqet û tedbîra xwe jî nedistand?

– Tedbîra xwe distand, lê digot:" Herhal ez ji xelkê xwe re dikarim xizmetekê bikim û yê ku vê yekê dibînin nerehet û aciz dibin û tehdîdan ji min re dişînin. Dema ku ez bi kêrî gelê xwe neyêm, jixwe min tehdît nakin." Cengiz ne ku nizanibû wê bê kuştin, lê dîsa xwe neda alî.

Piştî ku Cengiz şehîd ket, çi tesîr li ser malbata we kir?

– Cengiz ji ber ku hezkiriyê herkesî bû, hezkiriyê xelkê bû, der û dora xwe bû, bi wî şeklî jî hezkiriyê mala xwe û eqrebayê xwe bû jî. Temamî mala me, eşîra me heyranê Cengiz bûn. Piştî çûna wî, di nava me de tesîreke ewqas giran çêbû, me nema zanibû em çi bikin. Ji ber ku hezkirina wî dabû ser her tiştê me.

Ji bo berdewamkirina armanca wî hûnê çi bibêjin?

– Hezkirina Cengiz bi temamî li ser welatê wî, zimanê wî û li ser xelkê wî bû. Dixwest ku zimanê xelkê wî jî wekî yê xelkê dinyayê serfiraz be û dixwest ku ev xelk bi zimanê xwe nivîskariya xwe jî bike. Ji ber ku daxwaziya wî ew bû, em jî dixwazin piştî şehîdkirina Cengiz, daxwaziya wî bi vî şeklî were cih.

Dema Cengiz şehîd bû, bi 40 hezaran însan li Batmanê gihîştin hev û meşiyan. Lê vêga rewşa Batmanê guherîye. Sedem çi ye?

Emin Altun

– Sebeba ku guherîn li Kurdistanê çêbûye, giraniyeke pir mezin ji aliyê dewletê û ji aliyê hêzên tarî ve li ser xelkê hatiye danîn. Tirs li ser wan hatine afirandin; hatine girtin, hatine kuştin, gelek cinayetên failê meçhûl kirine ku xelk bitirse.

Xelk wexta ku dimeşin, dibêjin "Gelo ku em bêne dîtin, dîsa ewê werin hinekan ji me bikujin, an jî wexta ku em herin mala yekî ku şehîd ketiye û ku em li hev bicivin wê tiştek li me bikin an na?" Bi vî şeklî tirs çêbûye. Ne ku ev însan bira (bi rastî) ji doza xwe vegeriyane, ev însan di fikra xwe de bêhtir bi pêş ketine. Vêga ev xelk bi canê xwe, bi rih û bi her tiştê xwe, vê têkoşînê didomîne.

Tê gotin ku xelkên ku koçî metropolan dibin, ji têkoşînê dûr dikevin û diguherin...

– Xelkê me dixwaze li her derê meseleya xwe bi pêş ve bibe. Ev xelkên me yê ku ji welatê xwe hatine surgûnkirin an jî, ji ber hinek tiştan hatin tirsandin, li metropolan dîsa meseleya xwe bi temamî tînin bîra xwe. Li Kurdistanê çawa hereket dikin, li metropolan jî eynî bi wî şeklî têkoşîn û jiyana xwe ya berê didomînin. Ferqa ku vêga xuya dike sûnî ye, di demeke hindik de jî wê ji holê rabe. Ev xelk vê giraniyê wê ji ser xwe rake. Em dibînin li derve jî dîsa eynî wekî li Kurdistanê hereket dikin, meşa çêdikin, meseleya xwe tînin ziman, bi temamê dinyayê didine zanîn. Ev daxwaziya xelkekî ye. Ev meseleyê hanê bi kuştinê, bi girtinê nayê helkirin. Yek bê kuştin, wê çar rabin, çar bêne kuştin, wê deh rabin.

Gotina we ya dawî...

– Tiştê ku ez dixwazim bigihîjînim hevalên wî yên mektebê, hevalên wî yên rojnamevan û yên ku hê dinivîsin, bila netirsin. Xelkek wexta ku serfiraziyê bixwaze, di vê de kuştin jî, girtin jî, talankirin jî heye. Gerek e ev însanên hanê bi bawerî, durustî, însanî, wekhevî û bi biratî li herkesî bimêzînin (binêrin). Bi hezkirina însanan gerek e bigihin meqseda xwe û gerek e ev însanên ku xebat û xizmet kirine ji bîr nebin.

Hevpeyvîn:
AYNUR BOZKURT